*Mukaddime*, 2015, 6(1), 101-138
doi: 10.19059/mukaddime.41484

# Mela 'Eliyê Baqustanî û Mewlûda Wî

M. Zahir ERTEKİN[i]

**Puxte:** Baqustanî 'alim helbestvanekî kurd ê vê serdemê ye. Sê kurdî û şeş 'erebî, bi tevahî neh berhemên wî hene ku nehatine çapkirin. Di vê xebatê de em ê li ser *Mewlûdname*ya wî rawestin. Di serî de bi kurtasî em ê li ser mêjûya mewlûdê û kevneşopiya wê di nava civaka kurdan de bisekinin. Paşê dîsa bi kurtasî em ê jiyana Mela 'Eliyê Baqustanî peşkeş bikin. Di derbarê naverok û şeklî edebî yê *Mewlûdname*ya Baqustanî de hin agahî dê bêtin dayîn. Piştî hindê em ê li ser du nusxeyên wê yên destxet bisekinin. Dê transkirîpsiyona textstê orîjînal esas bête girtin û nusxeya duyem re bête berawerdkirin. Lewra di navbera nusxeya helbestvan û ya Qoxî de cudahî hene. Di metnê transkirîpsiyonê ev herdû nusxe bi hûrgulî hatine berawirdkirin.
**Peyvên Sereke:** Mewlûdname, İbn Hecer el-Heytemî, Mela 'Eliyê Baqustanî, Hezretî Pêxember, jidayikbûn.

## Molla Ali Baqustanî ve Mevlidî

**Öz:** Molla Ali Baqustanî, içinde bulunduğumuz yüzyılın önemli âlim şairlerindendir. Üçü Kürtçe altısı Arapça olmak üzere dokuz adet basılmamış kitabı bulunmaktadır. Bu çalışmada onun Kürtçe kaleme aldığı Mevlidname'si incelenecektir. Evvela mevlidin kısaca tarihçesi ve Kürtlerde mevlid geleneğine değinilecektir. Ardından Molla Ali Baqustanî'nin kısaca hayatı sunulacaktır. Molla Ali Baqustanî'nin Mevlidi hakkında sanatsal, şekilsel ve muhtevaya yönelik bazı bilgiler verildikten sonra, eserin orijinal nüshasının transkripsiyonlu metni sunulacaktır. Ancak eserin bir diğer nüshası da vardır ki, şair hayatta iken Molla Hilmi el-Koğî'ye yazdırmıştır. Koğî, inanç ve itikat açısından mahzurlu gördüğü bazı mısra ve beyitleri çıkarmış ve bazı mısra ve beyitleri de yine kafiyeye uydurmak için düzeltmeye gitmiştir. Az sayıda bazı beyitleri de kendisi ilave etmiştir. Bu çalışmada ilave olarak bahsi geçen ikinci el yazması nüsha, asıl nüshayla karşılaştırılarak farkları dipnotta verilecektir.
**Anahtar Kelimeler:** Mevlid, İbn Hecer el-Heytemî, Molla Ali Bakustani, Hz. Peygamber, doğum.

[i] Yrd. Doç. Dr., Bingöl Üniv., Fen Edebiyat Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatı Bölümü, zahirertekin@hotmail.com.

## Mullah Ali Baqustanî and his Mawlid

**Abstract:** Baqustanî is one of the most important scholar poets of the 20th Century. Baqustanî wrote Kurdish and Arabic poems and has three Kurdish and six Arabic, a total of nine unpublished works. In this study, one of his works in Kurdish, the mawlid will be reviewed. This study would initially introduce brief history of the mawlid and the mawlid tradition among Kurds. After providing artistic, formal and contextual information on Mullah Ali Baqustanî's mawlid, the transcribed original text of the work will be presented. However, there is another version of the work, which is written by Mullah Hilmi el-Koğî under the auspice of the author while he was alive. Koğî omitted certain verses he considered objectionable and corrected some to keep the rhyme. He also inserted some of his own. This study will further compare the two versions by providing the differences in the second version in the footnotes.

**Keywords:** Mawlid, İbn Hacer el-Heytemî, Mullah Ali Baqustanî, Mohammad, nativity.

### Destpêk

Ji dayikbûna pêxemberê Xwedê, mucîzeyên ku di vê pêvajoyê de derketine holê, mijara mîracê, û herwiha jiyana pêxember a zarokatiyê hetta wefata wî mijarên sereke yên mewlûdên kurdî ne. Ev cûre, di edebiyata islamî-kurdî- tesewifî de ciyekî gewre û taybet werdigire. Ev rewş bêşik bi Bateyî destpê kiriye û heta roja me hatiye. Bi vî awayî bi hêsanî em dikarin bêjin ku lûtke û şahiqaya mezin mewlûda Bateyî ye. Bi salan piştî Qurana pîroz herî zêde ev berhem hatiye xwendin û guhdarîkirin.

Mewlûdên ku piştî ya Bateyê hatine nivîsandin, piranî yan wergera mewlûda Bateyî nin, yan jî teqlîd an nazîre nin ji ya Bateyî re. Ji ber xurtiya edebiyat û selaseta mewlûda Bateyî, yên mayî pir meşhûr nebûne û ji gel 'eleqeyeke mezin nedîtine. Gelek ji wan çap jî nebûne.

Mewlûda Baqustanî jî yek ji wan mewlûdên ku derfeta çapê nedîtiye û nehatiyê nasîn û nehatiye zanîn e. Bi vê xebatê me xwest ku navê mewlûdnameyeke kurdî li hêjmarên mewlûdên kurdî zêde bibe û berhemeke din ji wendabûnê rizgar bibe. Nusxeya helbestvan bi awayekî saxlem li ber deste me ye. Herwiha nusxeya duduyan ya ku helbestvan bi xwe dabû nivîsandin jî li ber destê me ye. Me herdû nusxe berawird kirin û cudahiyên wan derxistin holê. Dîsa bi awayekî vebirî em dizanin ku ji bilî herdû nusxeyan tu nusxeyên vê wewlûdê nîn in.

Me di transkirpsiyonê de alfabeya transkiripsiyonê bikaranî. Herwiha li binê her rûpelekî me ferhengogeke wê rûpelê danî. Ji bo berawirdkirinê me nusxeya helbestvanî eses pejirand û cudahiyên nusxeya din (a Mela Hilmiyê Qoxî) li binê rûpel destnîşan kir. Li pişt riste an malika cuda di nava kevanekê de weke (Qoxî) nivîsand.

Di vê gotarê de mebesta me ne ew e ku em bi hûrgulî li ser cûreyê mewlûdnameyê rawestin. Tenê me xwest ku mewlûdeke destxet çap bibe û bigihêje newala kurdî. Ji ber vê yekê me mijarên giştî kurt birîn. Jînnameya helbestvan jî -ji ber ku berê di hin gotaran de hatibû çapkirin-[1], bi kurtasî kete nava rûpelên vê xebatê. Herweha berî vê xebatê Baqustanî bi dîwana xwe ya neçapbûyî[2], bi Siltan Şêxmûs'a destxet û bi texmîsên xwe[3] ketibû qada lêkolînan. Loma li vê derê heta ku ji me hat me giranî da mewlûdnameya wî.

**1. Kurtemêjûya Mêwlûdnameyê**

Bêjeya *Mewlûd*ê ji zimanê 'erebî tê. Wateya wê ya ferhengî, ciyê jidayikbûnê û dîroka jidayikbûnê yê (Îbn Manzûr, 1990: 468). Ev wate di nava demê de guheriye; jidayikbûna cenabê pêxember, pîrozkirina vê rojê û merasîmên/dêrindêzên wê û herwiha mesnewî û risteyên ku di vî warî de hatine nivîsandin hemû di binê vê wateyê de hatine kom kirin (Pakalın, 1993: 522); (Çelebî, 1984: 1).

Hê Pêxember (s.x.l.) li jiyanê bû, hin eshabiyên wî yên helbestvan weke Abdullah b. Rewaha (w.8/629), Ka'b b. Zuheyr (w.24/645) û Hesen b. Sabît (w.54/674) helbestên ku mijarên wan nêzîkî mijarên mewlûdê ne nivîsandibûn. Piştî van, mewlûdên 'erebî hatin nivîsandin. Mewlûdên ku neteweyên din nivîsandine, bi piranî yan ji 'erebî hatine wergerandin yan jî, ji 'erebî sûd wergirtine û hatine nivîsandin (Çağmar, 2004: 13).

Ji bilî kevneşopiya mewlûdnameyan herweha pîrozbahiya wan jî mijareke serbixwe ye. Pîrozbahîya mewlûdê ji dema Fatimiyan dest pê kiriye. Zavayê Selaheddînê Eyyûbî, Muzaferuddîn Gokboro (m. 1232), merasîmên mewlûdê li Îran, Anatoliya û Sûriyeyê belav kiriye (Pakalın, 1993: 522) Ji ber ku li devereke fireh ev merasîm bi destê Muzaferuddîn Gokboro hatine belav kirin û weke şênahiyên herêmî hatiye pîrozkirin. Ev zat, di vê mijarê de weke mirovê pêşîn tête naskirin.

Di hemû dewletên îslamî de merasîmên mewlûdê hatine lidarxistin. Herwiha di dema Osmaniyan de, piştî Mûradê sêyemîn, pîrozbahiyên mewlûdê bi awayekî fermî hatine lidarxistin (Pakalın, 1993: 522). Di dewra Osmaniyan de, mutesewifan pêwendiyeke mezin dane mewlûdan û di vî warî de bandoreke mezin li ser gel kirine (Çubukçu, 1984: 265) Çawa ku di her demê de kesên ku bi coş beşdarî van merasîma bûne hebûne, wisa jî di serî de mewlûd bi xwe, û dû re jî pîrozkirina wê, li gorî hin kesên din bid'e ye û ne îslamî ye. Ji ber vê yekê kesên ku li hemberî van merasîman derdikevin ji berê de hene. Îroj jî rewş bi vî awayî ye.

[1] Bnr. M. Zahir Ertekin, "Mele 'Elîyê Baqustanî û Helbestek e Wî: *Ey Felek*", Kovara Nûbihar, h. 113, r. 43-44, Stenbol 2011.

[2] Bnr. "Mela 'Eliyê Baqustanî û Berhemên Wî Yên Kurdî", *Rojên Edebiyata Kurdî Ya Bakur- Rojava,* Yekîtiya Nivîskarên Dihokê, Dhok 7- 9/11/2013.; Jiyan û Berhemên Mela 'Elî Baqustanî, Amd. M. Zahir Ertekin, Berhema Neçapbûyî, r.3-4.

[3] Bnr. M. Zahir Ertekin, "Di Edebiyata Klasîk a Kurdî De Texmîs û Texmîsên Mela 'Eliyê Baqustanî", Zanîngeha Artûklûyê, Kovara Enstîtuya Zanistên Civakî Mukaddime, H. 6, Mardin 2012, s. 71-85.

**2. Kevneşopî û Bikaranîna Mewlûdên Kurdî**

Di nav gelê Kurd de, kevneşopiya nivîsîn û xwendina mewlûdê li gorî delîlên heta niha, bi Melayê Bateyî dest pê kiriye. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (ss 17-18an) di nav kevneşopiyên kurdan de cihekî girîng digire. Berî mewlûda Bateyî Kurdan mewlûdên 'erebî bikar dianîn. Piştî ku Bateyî mewlûda xwe nivîsand, seranserê Kurdîstanê ev nusxe bikaranî, tevî ku mewlûdên 'erebî jî li hin deran dihate 'emilandin. Çanda mewlûdê di nav civaka kurdan de ewqas zindiye ku kengî zarokek çêbibe, kengî kurek bê sinetkirin, ku yek ji leşkeriyê hat, roja dawetekê, yek ji hecê hat, yekî serkeftinek bi dest xist, ji pêkanîna qewlekî weke nezirkirinê, kengî kesek bimre di te'ziya wî kesî de, çaxê xêrekê, di ber bela û musîbetekê de mewlûd tê xwendin û paşê jî xwarin tê xwarin.

Helbet ji bilî Bateyî gelek helbestvanên kurd jî mewlûdname nivîsîne. Heta niha li ser hêjmarên mewlûdnameyên kurdî rast û durust xebat nehatine kirin. Lê me heta niha 32 kurmancî, 7 zazakî 10 soranî û hewramî, bi tevahî 49 mewlûdname tespît kirine. Helbet hêjmar ji vê zêdetir in û hêjmarên mewlûdên kurdî xebateke serbixwe ye. Belki di prosesa nivîsîna van mewlûdan tişta herî balkêş, mewlûdên ku hatine tespîtkirin piranî di van salên dawî de hatine nivîsîn. Demeke dirêj a vala di navbera mewlûdên nû û mewlûda Bateyî de heye. Sedemên vê dema dirêj a nebûna/nezanîna mewlûdên kurdî çi ne, baş nehatiye tespîtkirin. An sedemên demdirêjiya di navbera yekem û duwem mewlûda kurmancî çi ne, baş nehatiye kolandin. Herwiha ev, mijareke sereke ye û bi serê xwe ye, ku divê ji aliye lêkolerên edebiyata klasîk a kurdî ve bête vekolîn (Kızıl, Şıngar, Çetin, 2015: 61-64). (Kırkan, 2011: 49-55).

**3. Mela 'Eliyê Baqustanî Kî ye?**

Mela 'Eliyêyê Baqustanî, di sala 1917'an de li gundê Tizyan ku bi Stewra Mêrdîn ve giridayiye hatiye dinê. Navê bavê wî Mihemed û navê diya wî 'Edlê ye. Bavê wî Mela Mihemed, melê gund bû. Mela Mihemed, ji xeynî Tizyan li Baqustan û li 'Ewîna jî melatî kiriye. Bi 'eslê xwe ji Zivinga Hecî 'Elya ye, ku niha ev gund bi navçeya Sêrtê, Dihê/Erûhê ve girêdayî ye. Bavê wî Mela Mihemed dema ku diçe hecê li wir wefat dike. Li Texma *Wadî Fatma* medfûn e. Piştî wefata bavê wî, malbat ji gundê 'Ewîna dîsa vedigere Tizyan.

Mela 'Elî, xwendina xwe ya sereke li ba bavê xwe dixwîne. Paşê diçe 'Ewîna li ba Mela 'Evdil'ezîz didomîne. Paşê diçe gundê Qerepêçê, ku niha li ser navçeya ye, li ba Mela 'Evdilwehabê Xirbê Hecî xwendina xwe didomîne. Piştî ku Mela 'Evdilwehab ji vî gundî bar dike, ew di şûna wî de Melatiya vî gundî dike. Paşê tê Baqustan û li vir dest bi melatiyê dike. Di salên nodî de, gund tê şewitandin û Seyda ji Baqustan bar dike û li Amedê bi cî dibe. Nêzîkî wefata xwe, dîsa diçe gundê xwe û li gundê xwe wefat dike (2002). Tirba wî jî li Baqustan e (Ertekin, 2011: 43).

## 4. Mewlûda Mela 'Eliyê Baqustanî

### 4.1. Nusxeyên Mewlûdê

Du nusxeyên mewlûda Baqustanî henin. Yek jê destxeta wî bi xwe ye, ya din jî ya Mela Ehmed Hilmiyê Qoxî ye.

#### a. Nusxeya Destxeta Baqustanî

Di forma deftereke ku helbestvan bi destê xwe amade kiriye û kabeke kartonî jê re çêkiriye de, hatiye amade kirin. Kaxezên berhemê nîvzere ne. Di çarstêla tîk û forma 25x16 de ye. Her rûpel bi qelema helbestvan bi baldarî hatiye amadekirin. Bi qelemeke ku hibra wê şîn e, çarçoveyeke ku kaxizê dike du histûn, xet ji bo risteyan hatiye kişandin. Di her rûpelekê de 14 malik hatine bicîhkirin. Mewlûd 44 rûpel û 13 beş e. 5 rûpelên dawî duaya mewlûdê ye. Kurdî ye û pexşan e. Di serî piştî *Besmele*yê "*Haza tercumetû mewlûd lî-ibn Hecer el-Heytemî*"[4] hatiye nivîsîn. Bi vî awayî em pê dihesin ku mewlûd werger e. 12 caran malika dîsgotinê/neqeratê tête dubare kirin. Tevî 12 dubareyên dîsgotinê mewlûd 519 malik e.

#### b. Nusxeya Destxeta Mela Ehmed Hilmiyê Qoxî

Di çarstêla tîk û forma 25x16 de ye. Li ser berga wê weke navê berhemê "Mewlûdu'n-Nebî 'eleyhi's-selâtu we's-selâm" hatiye nivîsîn. Li binê vî navî nav û nîşana nivîskar "Li'l-'âlimi'l-kebîr el-ustâz Melâ 'Elî el-îmâm bi qeryeti Baqustân" nivîsandiye. 6 rûpelên duaya dawî ne tê de, mewlûd 33 rûpel e. Tevî 12 malikên dîsgotinê mewlûd ji 482 malikan pêk tê. Bi vî awayî tête dîtin ku Qoxî 37 malik ji nusxeya orijînal kuştiye. Hêjmara beşan di vê nusxeyê de jî 13 ye.

### 4.2. Ziman û Naveroka Mewlûda Baqustanî

Helbestvan herî zêde peyv û hêmanên 'erebî tevlî kurmanciya xwe kiriye. Bi sedan bêje, û terkîbên 'erebî di berhemê de hatine bikaranîn. Di berhemê de gelek peyvên erebî hene ku tesewifî ne. Helbestvan bi dilekî rehet hêmanên erebî bikar anîne. Ji ber ku peydakirina kurdiya wan him dijwar e him jî rasterast bi wateyê çêkirina têkildariya wan ne pêkan e. Mewlûd tevî ku terkîbên erebî tê de hebin jî, dîsanî bi gelemperî, bi kurdî/kurmanciyeke sivik, herikbar û rewan hatiye nivîsîn. Herçend bi kêşeyê ve hatibe nivîsîn jî, zimanê wê gelek caran wekî

[4] Yanî ev, wergera mewlûda Îbn Hecerê Heytemî ye. Îbn Hecerê Heytemî: Şair û edîbê 'Ereb e. Bi mewlûda xwe ve deng daye. Navê wî yî 'eslî Ehmedê kurê Muhemmed e. Di sala 1504ê mîladî de li Misrê hatiye dinyayê. Piştî ku xwendina xwe diqedîne li Mekkeyê bi cî dibe. Di warê fiqhê de xebitiye û di mijarên dînî de li gorî mezhebê Şafi'î fetwa daye. Ji aliyekî jî mûtesewif e. Di sala 1567an de li Mekkeyê wefat kiriye. Di derbarê tesewif, hedîs, 'eqaîd, dîrok, jînenîgarî û hîn gelek beşên 'ilmî û dînî de berhem nivîsandiye. Ji van berheman hinek ev in; *Tuhfetu'l-Muhtâc, Fetewâu'l-Kubrâ, İqtîrafu'l-Kebîr, Şerhu Qesîdeti'l-Burde.* Navê mewlûda wî "*En-Ni'metu'l-Kubrâ*" ye. Di nava mewlûdên 'Erebî de ya herî tê zanîn ev e. Kêmzêde 20 rûpel e. Mewlûda wî hem nezm e hem jî nesr e. Bi vî awayî jî girîng e. Di serê mewlûdê de hin ayetên ku behsa exlaqê pêxember dike, cih girtiye. Bi duayê mewlûd bi dawî dibe. (Di derbarê Îbn Hecerê Heytemî de ji bo zêdetir agahî bnr. "M. Edip Çağmar, *Edebi Açıdan Arapça Mevlitler*, İlahiyat Yayınları, Ankara, 2004. r. 80-84" û; Cengiz Kellek, "İbn Hacer el-Heytemi", DİA, XIX, r. 531.) Mela 'Elî Baqustanî jî li gorî mijarên vê mewlûdê, mewlûda xwe bi awayekî nezmane nivîsiye.

axaftina rojane ye. Li gorî dîwanên klasîk ên kurdî zimanekî sadetir û siviktir hatiye bikaranîn.

Berhem bi awayê tertîba klasîk bi *besmele*yê dest pê dike.

**Beşa 1.** Ji 68 malikan pêk tê. Sipasiyên ji Xwedê re û pesnê cenabê pêxember mijarên sereke yên vê beşê ne. Li gerdûnê berî her tiştî nûra cenabê pêxember hatiye afirandin. Di mewlûdnameya Bateyî de jî ev mijar heye. Berî ku Adem bête zanîn, cenabê pêxember bi nûra xwe hebû.

*Ew li ʻezman û di cennet xweş dibû*

*Ne ku Âdem ne jî însan kes nebû*

*Navê Âdem qet nebû hêj ew herî*

*Pur zemanek ew dima şil û terî (B.1. 3-4)*

Herwiha bi hatina cenabê pêxember kêfxweşiya hemû hebûnan, nirxa mezin a resûliya wî û serokbûyîna wî ya ji temamê pêxemberan re bi awayekî pesindane hatiye vegotin.

**Beşa 2.** Ji 63 malikan pêk tê. Mijara sereke ya vê beşê pesindayîn û fezîleta mewlûdê ye. pîrozbahiyê vê rojê, gotinên kesayetên olî yên mezin di derbarê pîrozbahiya mewlûdê de hatiye vegotin. Di serî de çar xelîfeyên îslamê, Hesenê Besrî, Cuneydê Bexdâdî, Me'rûfê Kerxî, Fexredînê Râzî, Şâfiî û hîn ji gelek kesên girîng ên dîtir, di vî warî de rîwayet hatine neqilkirin.

*Got Ebûbekrê ku siddîqê Xweda*

*Kî li mewlûda nebiyyê Ehmeda*

*Ku ji malê xwe wî serf kir dîrhem e*

*Ew refîqê min di cennet bê xem e (B.1. 1-2)*

**Beşa 3.** 16 malik e û mijara sereke hin hedîsên/gotinên cenabê pêxember di derbarê heşrê/roja qiyametê de ye.

**Beşa 4.** 36 malik e. Di derbarê bejn û bala cenabê pêxember û behsa hin taybetmendî û weswên Wî de ye. Agahiyên ku hatine dayîn jî bi çavkanî ango ji kî/kê hatibe rîwayet kirin, diyarkirî ye.

*Ê di gotî wî ʻEliyyê Heyder e*

*Tim ridaa Rebbê ʻalî li ser e*

*Got Muhemmed ew bi bejnek pur şerîf*

*Ew ne kin bû ne dirêj û ne de'îf*

*Ew bi mill û hem bi çogê baş dirêj*

*Qet di wî de ji qusûr a tu nebêj*

*Ser û rihê wî dinêrî pur temîz*

*Hem bi qûwwet hem jî xweşşik ew 'ezîz (B.1. 1-2-3-4)*

**Beşa 5.** Ji 30 malikan pêk tê. Mijara sereke ya vê beşê taybetiyên xas yên cenabê pêxember û hin mucîzeyên wî ne. Helbestvan di serî de girîngiya û vebirîbûyîna mucîzeyê tîne zimên û dibêje bêhîsab mûcîzeyên Wî hene. Mûcîzeyên ku ketine vê beşê, ji devê rawîyan hatiye vegotin/neqilkirin.

**Beşa 6.** 19 malik e û mijara sereke zewaca bavê cenabê pêxember û xwestina Amîne ye. Herwiha behsa de'wetê jî di vê beşê de bi cih bûye.

**Beşa 7.** Ji 46 malikan pêk tê. Mijara vê beşê hemla diya cenabê pêxember Amîne ye. Meh bi meh hemla Wê hatiye vegotin û bûyerên awarte yên di vê demê de qewîmîne hatiye serîşte kirin.

**Beşa 8.** Ji 38 malikan pêk tê. Mijar mûcîzeyeke cenabê pêxember e û bi dirêjahî tenê behsa vê mûcîzeyê hatiye kirin.

**Beşa 9.** 67 malik e. Mijara vê beşê neseba cenabê pêxember, bav û bapîrên wî, hin xusûsiyetên wî û nûwazebûyîna Wî ne. Hin mûcîzeyên Wî û mijara Mîracê jî mijarên biçûk ên binê vê beşê ne.

*Weqta mî'racê bûraqê hurmet dikir*

*Qet di rêda çûbû hat û deng nekir*

*Pur 'esa kir jê vexwarin têr ji ava tiliya*

*Hem bi pêket koka darê tevlî rah û guliya*

*Wî biçûkê jê bixur da tekellum bi xweşî*

*Ew di destê wî şerîf da bi heşî*

*Pur xeber dabû sebiyyê hîn li şîr*

*Murtezayê tu ji Rebb ê xwey kebîr (B.9. 35-36-37-38)*

**Beşa 10.** 22 malik e. Behsa xêra selewatdayîna li ser pêxember û mifayê wê dike.

*Ev selatê ser Muhemmed pur sewab*

*Ê bi 'işqê wê bixwîne cennet meab*

*Hem selatê ser Muhemmed di sewab*

*Purî xêrtir ew ji 'itqa pur rîqab (B.10. 1-2)*

**Beşa 11.** 31 malik e. Mijar di bihemlebûna Amîne de, hatina pêxemberan a xewna wê şîrove dike. Pêxember hatine xewna Wê û hurmetên xwe jê re pêşkêş kirine û herwiha Wê pîroz kirine ji bo bihemlebûna Wê ya bi cenabê pêxember.

*Meha çara hatî yek dî bi selam*

*Ya Hebîbellah digotî xweş kelam*

*Min dipirsî di cewab ê ezim Nûh*

*Ev e hemla te xwediyyê nesr û futûh (B.11. 16-17)*

**Beşa 12.** 74 malik e. Beşa herî dirêj a mewlûdê ye. Mijara wê jidayibûyîna cenabê pêxember û di bûyerên wê rojê ne.

**Beşa 13.** 20 malik e û behsa selewatan li ser cenabê pêxember dike. Weke di jor de jî derbas bû ev beş bi 'erebî ye û di forma mewlûda Heytemî de hatiye nivîsîn. Di mewlûdên kurdî de ev beş, beşa *merheba*yê ye, lê form di vê mewlûdê de cuda ye.

Di dawiya her beşê de *beyta wasîteyê* heye. *Beyta wasîteyê* di mewlûda Bateyî de tune. Ew beyit jî ev e:

*Ey Muhemmed sed hezaran aferîn*

*Tim li ser te pur selat ji qelbê birîn*

Dîsa piştî beyta wasîteyê, berî ku beşeke nû dest pê bike *beyta dîsgotinê* heye. Dîsgotina mewlûda Baqustanî bi vî şiklî ye:

*Din selata ser Muhemmed bê hîsab*

*Ger dixwazin hûn xelasa ji 'ezab*

Dîsgotin jî bêguman kevneşopiya xwe ji mewlûda Bateyî werdigirin. Di temamê mewlûdên kurdî de ev malik heye. Him dema ku xwîner/qesîdebêj mewlûdê dixwîne di vê malikê de bêhna xwe berdide, him jî îşaretê bal xelasiya mijarê û nîşana beşeke din e. Dîsgotin li ser dana selewatan hatiye organîze kirin. Ji bo teşwîqa selewatê jî, hêviya xelasiya ji agirê dojehê li ber godarvan û

xwendevanan tête danîn. Ango şertê xelasiya ji êgir weke dana selewatan tête pêşkêşkirin. Bi hevok û bêjeyên xwe dîsgotina mewlûda Baqustanî cuda be jî bi wate dîsa teqlîda Bateyî bi hêsanî tête fêmkirin. Dîsgotina Bateyî wiha ye:

*Ger divêtin hûn ji narê bin necat*

*Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin esselat*

Hin rêzikên mewlûda Baqustanî ji ya Bateyî hatine wergirtin. Lêbelê hêjmara wan ne pir in. Mînak;

*Ya ku ewwel ew dihatî gotî weha*

*“İbşîrî ya Âmîne bi’l Mustefa” (Mewlûda Baqustanî)*

Mahê samin hatî Mûsa ba wefa

İbşîrê ya Emîne bil Mistefa *(Mewlûda Bateyî)*

*Hemdê bê hed bo Xwedayê pur şerîf*

*Nûr û qûwwet daye ummeta de’îf (Mewlûda Baqustanî)*

*Hemdê bê hed bo Xwedayê alemîn*

*Ew Xwedayê daye me dînê mûbîn (Mewlûda Bateyî)*

Pişka *merheba*yê ji kêşeya beşên din dûr ketiye. Helbestvan beşa merhebayê di forma berhema orîjînal a Heytemî de nivîsiye. ‘Erebî ye û bi wate nêzwateya mewlûdnameya Heytemî ye. Mînak ji bo her pênc malikên pêşîn ên beşa merhebayê ya herdû mewlûdan:

Es-selâtu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk

Yâ seyyide’l-ebrârî

Es-selâtu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk

Yâ Mustefe’l-muxtârî

Es-selâtu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk

Yâ nûre’l-‘ibâdî

Es-selâtu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk

Yâ nâsihe’l-‘ibâdî

Es-selâtu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ menbe’e’l-furqânî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ sâhibe’s-sultânî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ tâce’l-etqiyâî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ xâteme’l-enbiyâî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ sâhîbe’l-mi’râcî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ sahibe’l-ferecî

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ Resûlallah

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ hebîbellah

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk
Yâ sefwetellah

Es-selatu ‘eleyk es-selâmu ‘eleyk

Yâ xeyre xelqillah

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Tahâ ya mûeyyed

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Ehmed ya Muhemmed

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Yâ xîretellah

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Yâ şefî'e'l-muznibîne 'indellah

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Yâ zeyne'l-bîlad

Es-selatu 'eleyk es-selâmu 'eleyk
Yâ mehdî we hadî (Çağmar, 2004: 82).

### 4.3. Wezn û Hunerên Mewlûda Baqustanî

#### 4.3.1. Wezna Mewlûdê

Wezna mewlûdê "Fâ'îlâtûn Fâ'îlâtûn Fa'îlûn" e ku heman kêş di mewlûda Bateyî de jî hatiye bikaranîn (İlhan, 2013: 17). Herwiha Behra Remelê û qalibê nasalim e.

#### 4.3.2. Hunerên Edebî Yên Mewlûdê

Mewlûda Baqustanî ji 519 malikan pêk tê. Li gorî vekolîna me di 60 malikan de 22 hunerên edebî hatine bikaranîn. Helbestvan hem zimanê herikbar û sade parastiye û hem jî ji huneran sûd wergirtiye. Li jêr em ê li ser van hunerên edebî bi kurtasî rawestin û ji bo her hunerekê jî yek-du mînakan bidin.

**Îştîqaq/îttîhad**

Ew cure bikaranîn e ku ew; -herî hindik du- bêjeyên ji heman reh û bingehê tên. Têkiliya wê bi alîterasyon û asonasê jî heye. Lê şertê sereke ev e ku, kokên bêjeyan ‘eynî bin (Kocakaplan, 1992: 80).

Hatî wexta wan muhibba bi hevdûr bibin

Hema *talib* hem jî *metlûb* dilxweş bibin (12/46.)

**Sîhrê helal**

Di dawiya risteya yekem û di serê risteya duwem de, bêyî ku wate ji hev qut bibe bikaranîna bêje an koma bêjeyan e. Ji ber ku pişta xwe dide wateya bêjeyê, dikeve koma hunerên wateyî (Kocakaplan, 1992: 124).

Merheba got ya Muhemmed *min digot*

Çi kesî tu ez im Adem wî digot (11/7.)

Min dipirsî ez im İdrîs di *cewab*

Gotî hemla te nebî ye hem reîs e bê ‘ezab (11/15.)

**Sûal û Cewab/Pirs û Bersiv**

Di vê hunerê de pirs û bersiv bi hev re di nava malikê de cih digirin (Coşkun, 2007: 202).

Ya Hebîbî *ki ye* ew kes bêj jimer

Di *cewabda* go bexîl e ev qeder (10/19.)

**Tekrîr/Dûbareyî**

Di vê hunerê de ji bo tekîda vegotinê bêje têne dûbarekirin. Bêjeya ku tête dûbarekirin sereke erka wateyê hildide ser xwe. Herwiha ev bêje bi heman wateyê tête dûbarekirin (Saraç, 2000: 33).

Mewlida wî dûwazde ê Ewwel Rebî’

Nav *rebî’* bû hem *rebî’* bû hem *Rebî’* (9/58.)

**Tewriye**

Bêjeyek duwate ye, piranî wateyeke xwe ya nêz û yeke dûr heye. Di vê hunerê de di bikaranîna bêjeyeke du wate de, wateya wê ya dûr tête mebest kirin. Bi gotineke din hunermend/helbestvan wateya bêjeyê ya dûr bi kar tîne lê ew xwendevan bi wateya wê ya nêz ve jî dixe nava têkiliyê. Bi vî awayî vegotin û îfade derfeta berfirehiyê bidest dixe (Saraç, 2000: 188).

Ew beşîr bû cennetî ra mizgîn dida

Hem *sîrac* bû ku ji wan ra *ruhnî* dida (9/54.)

**Alîterasyon û Asonans**

Alîterasyon, ji bo hevahengiyê dûbarekirina heman dengan e. Divê dengê ku tête dûbarekirin dengdar be. Ji ber ku dengdêr be dibe asonans. Herwiha ev herdu huner (alîterasyon û asonans) weke teşxîs û întaqê tên tevlîhevkirin. Lewra di risteyan de bi piranî dengdêr û dengdar li cem hev têne dîtin. Ji ber vê yekê hunera alîterasyon û asonansê di heman demê de derdikevin holê (Kocakaplan, 1992: 17).

Pur kerîm û hem qesîm û hem wesîm

Ew ji husnê ra 'elamet bû helîm (9/50.)

**Leff û neşr (Berhevkirin û Belavkirin)**

Piştî vegotina çend têgehan, ravekirina taybetiyên wan e. Bi gotineke din piştî vegotina dudu yan bêtir têgehan, vegotina têgehên bi wan re têkildar e (Saraç, 2000: 164).

Ew nebiyyê *heremeyna* hem li dûrê fethiye

Ew *Mekkiy* û *Medeniy* û ebtehiyy e (9/12.)

**Mecaza Mursel**

Du cure wateyên peyvan hene. A yekem, dema ku peyv tê gotin wateya herî sivik û ya 'ewil tê bîra meriv. Ji vê re wateya heqîqî ango wateya rasteqîn tê gotin. Ya din, peyv ne di wateya xwe ya heqîqî de ye. Ji wateya xwe ya sivik û rasteqîn bi dûr dikeve. Ji vê wateya peyvê re jî wateya mecazî tê gotin. Di mecaza mursel de peyv, bêyî ku mecaz bête qest kirin di wateya wê ya dûr dê tête bikaranîn (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 179).

Pê şiyar bûna melaîk hem jî xulam

*Çawa teblîxa sema kir ew bû temam* (8/28.)

**Teşxîs û Întaq (Nasan û Danaxaftin)**

**Teşxîs** ew tişt e ku wesf û taybetiyên însanî li heyînên din dike. Dar bimeşe, kevir bibihîse hingê taybetiyeke însanî li wan têne kirin. **Întaq** jî heyînên ku wesfa wan a axaftinê nîne, danaxaftina wan e. Herwekî ku çîçeka ku li koşeyeke malê de bi cih e, bipeyive (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 176).

Bike gazî tu li ehlê erd û sema

Da şiyarbin ins û kaînat hema (7/5.)

Mu'cîzatê purrî zahir jê beyan

*Gur û hirça wekî wana îxbar didan* (9/33.)

**Telmîh**

Di nava vegotinê de îşaret bal bûyerekê kirin e ku ew, bûyereke meşhûr e. Bibîrxistina/destnîşankirina, bûyerekê, kesayetekî dîrokî, serpêhatiyeke navdar an mijareke zanistî ye (Kocakaplan, 1992: 148).

Hem ji Îbrahîm Xelîlûllah heseb

Hem ji Îsma'îl Zebîhûllah neseb (9/14.)

**Îstî'are**

Wateya bêjeyeke demî ye ku di derbarê bêjeyeke din de tê bikaranîn (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 178).

Ew Muhemmed *tacê* rusl û enbiyan

Hem serekdarê teqiyy û ewliyan (1/2.)

**Cînas**

Ew bêje ne ku dengên wan 'eynî lêbelê wateyên wan cuda tên bikaranîn (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 186).

Navê Âdem qet nebû hêj ew *herî*

Pur zemanek ew dima şil û *terî* (1/4.)

Ger bixwînin wê li ser hinek *pera*

Ew jî têkev xeyrî wana jê *pera* (2/29.)

**Îktîbas**

Ji bo pihêtkirina wateyê an ji bo rindkirina gotinê ji helbestvanekî, neqilkirina ji ayetekê, ji hedîsekê an ji gotineke pêşiyan wekî îqtibas tê zanîn (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 182).

Me tu şandî *rahmeten lîl'alemîn*

Hem ji ins û hem cinan re ecme'în (1/7.)

**Tenasub**

Peyvên ku têkiliya wan bi hevre hene, bêyî ku wateya wan a tezad bête qestkirin bi hev re bikaranîna wan e (Kocakaplan, 1992: 151).

Tu *'ezîz* û hem *hekîm* û hem *'elîm*

Wî qebûl kir hem jî şandî ev *kerîm* (1/20.)

Ruhniya çavê *xerab* û *'asiya*

Tu gihîştî wan *meqam* û wan *ciya* (1/46.)

**Tezad**

Bikaranîna wesfên dijberî hev ên di navbera du raman, xiyal û dilînan de wekî tezad tê navandin (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 184).

Ger di heqqê wî digotin zalima

*Muşrîkê cahil* û *kafir 'alima* (1/21.)

Ew ji bo *başa* ew bi 'ewnet bê hîsab

Purê fuccar û *xerab* dane 'ezab (9/42.)

**Teşbîh**

Teşbîh, di nabeyna du heyînên ku bi çend awayî dişibin hev de, şibandina yê lawaz bi bal ê xurt ve ye. Di vê şibandinê de piranî daçekên "weke", "mîna", "şibhê", "şubhetê", "mislê" û wd. têne bikaranîn (Kocakaplan, 1992: 161).

Hem ji 'Îsa *ew* resûl e *wek* hîlal

Ê ku çêbû ew ji Meryem pur delal (1/30.)

Ew bi rengê xwe ji xelkê zêde dibû

*Wek gula sora* ku nû bû vedibû (4/8.)

**Îltîfat**

Têkiliya vê hunerê bi heyecanê ve heye. Di helbest an pexşanê de dema vebêjer mijarê vedibêje, di binê bandora heyacana xwe de dimîne û xîtabî şexsekî din an tiştekî din dike. Bi vî awayî berê mijarê diguhere. Lê divê ev xîtab bi mijarê re têkildar be. Ger ku xîtab bi tiştekî/kesekî bi mijarê re ne peywendîdar be hunera îltîfatê pêk nayê (Kocakaplan, 1992: 56).

Gotî 'Usman wî xelîfê pur heya

Ê ku qedrê wî mezintir ji çiya (2/5.)

**Tefrîq**

Tefrîq, ji bo mezinkirin û bilindkirina hêmanekê ji ya din, destnîşankirina ferqa navbera herdû hêmanan e (Kocakaplan, 1992: 143).

*Mûyê nûranî ji husnê pur beha*

Ew dirêj bû nûr dihatin nav guha (4/9.)

**Nîda**

Ev huner jî ji kelecana helbestvan derdikeve holê. Gazîkirina bi bangoka "ey" û "ya" yê ev huner pêk tê (Göktaş, Kalkandelen, Keleş, 2014: 185).

*Gotî Rebbî* Tu bişînî yek resûl

Ew ji nava wan û de'wet bib qebûl (1/17.)

Ew di cennet da di qesrê ‘illiyîn

*Ey hevala* guh bidêrin pur yeqîn (2/20.)

**Tarsî’**

Di malika helbestê de hevahengiya hêjmar, kêş û serwayê ye. Bi vî awayî di malikê de sîmetrîyek pêk tê (Kocakaplan, 1992: 133).

*Wan weqiyek zêrê xalis pur temîz*

*Hem weqiyek zîvê xalis pur ‘ezîz* (6/13.)

**Encam**

Mewlûda Baqustanî mewlûdeke vê serdemê ye. Ev mewlûd li gorî agahiyên ku em pê dizanin yekem mewlûd e ku ji zimanekî din hatiye wergerandin. Baqustanî mewlûda İbn-i Hecer el- Heytemî ya ku bi ‘erebî û pexşan e, û bi helbestkî wergerandiye kurdî. Tevî ku wergere jî Baqustanî di binê bandora Bateyî de maye. Ji aliyê hêjmara malikan jî ne mewlûdeke biçûk e û ne jî pir mezin e. Ji aliyê naverokê ve jî di wasatiya naveroka mewlûdan de ye. Berhem him ji ber ku destxet e, him jî du nusxeyên wê saxlem li ber destê me hene bala me kişand. Bi çapa vê gotarê berhemeke klasîk a vê serdemê kete nava lîteratura kurdî. Piştî agahiyên şiklî û taybetiyên naverokî yên mewlûda Baqustanî, emê derbasî metnê transkripsiyonê bibin.

Alfabeya Transkiripsîyonê ya ku me bikaranî ye ev e;

| | | |
|---|---|---|
| ث | s̱ | |
| ح | ḥ | Ḥ |
| ذ | ẕ | Ẕ |
| ص | ṣ | Ṣ |
| ض | ḍ, ż | Ż |
| ط | ṭ | Ṭ |
| ظ | ẓ | Ẓ |
| ع | ‘ | ‘ |
| غ | ġ | Ġ |
| ء | ’ | ’ |
| Apastrops | | ` |

**Çavkanî**

Coşkun, M. (2007). *Sözün Büyüsü Edebi Sanatlar*, İstanbul: Dergâh.

Çağmar, E. (2004). *Edebi Açıdan Arapça Mevlidler*, Ankara: Îlahiyat.

Çelebî, S. (1984). *Vesîletu'n-Necat Mevlîdi*, (nşr. Ahmed Ateş), Ankara: Türk Tarih Kurumu.

Çubukçu, İ. A. (1984). *Makaleler (Dinimizde Mevlidin Önemi)*, Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi.

Doskî, T., Doskî, M. İ. (1996). *Mela-yı Bateî We Behremi-yi wî*, Çaphâne-i Hawar, Dhuk-Irak.

Ertekin, M. Z. (2013). "Di Edebiyata Klasîk a Kurdî De Texmîs û Texmîsên Mela 'Eliyê Baqustanî", Mukaddime Dergisi, H. 6, Mardin.

……………… (2013). "Mela 'Eliyê Baqustanî û Berhemên Wî Yên Kurdî", *Rojên Edebiyata Kurdî Ya Bakur- Rojava,* Yekîtiya Nivîskarên Dihokê, Dhok. Irak.

Göktaş, M; Kalkandelen A.H; Keleş R. (2014). *Türk – İslam Edebiyatı*, Erzurum: Zafer Medya.

Kırkan, A. (2011). "Mewlidê Osman Efendi û Mewlido Zazakî", Kovara Nûpelda, H. 7-8, Wan.

Kızıl, H; Şınğar, C; Çetin, R. (2015). "Ceribandinek Li Ser Senifandina Mewlûdên Kurdiya Kurmancî Li Gorî Mijarên Wan", International Journal of Kurdish Studies, Diyarbekir.

Kocakaplan, İ. (1992). *Açıklamalaı Edebî Sanatlar*, İstanbul: Milli Eğitim Bakanlığı.

Pekolcay, N. (1980). *Mevlîd, Suleyman Çelebî*, İstanbul: Dergah.

Pakalin, M. Z. (1993). *Osmanlı Tarih Deyimleri ve Terimleri Sözlüğü*, MEB, C.2, İstanbul.

Sadînî, M. X. (2010). *Mela Huseynê Bateyî – Jiyan, Berhem û Helbestên Wî-*, Weşanxaneya Nûbihar, İstanbul.

Saraç, M. A. (2000). *Klâsik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, Stenbol: Bilimevi.

Îbn Manzûr, Ebu'l-Fadl Cemâluddîn Muhemmed b. Mukrîm. (1990). *Lisânu'l-'Ereb*, Daru'l-Fikr, c.3, Beyrût.

İhlan, Z. (2013). *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Enstituya Zimanên Zindî, Zanîngeha Mêrdînê, Mêrdîn.

Özkan, H. (2003). DİA, C.38, r.195. Ankara.

**TEKSTA MEWLÛDA BAQUSTANÎ**

BİSMİLLAHİRREHMANÎRREHÎM

HAZA TERCUMETU MEWLÛD LÎ İBNÎ HECER EL–HEYTEMÎ

**Feslê ewwel di behsa hemdê Xwedê û pesnê Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

**r. 1.**

Ḥemdê bê ḥed bo Xudayê pur şerîf
Nûr û quwwet daye ummeta że‘îf

Ew Muḥemmed tacê rusl û enbiyan
Hem serekdarê teqiyy û ewliyan

Ew li ‘eẕman û di cennet xweş dibû
Ne ku Adem ne jî insan kes nebû

Navê Adem qeṭ nebû hêj ew ḥerî
Pur zemanek ew dima şil û ṭerî

Ew ṣefiy yû hem ḥebîb û hem ṭebîb
Hem xuṣûṣa ew di nav ‘alem mucîb

Eṣdeqê qaîl ‘eẓîm û hem ‘elîm
Jêr beyan kir ev di Qurana Kerîm

Me tu şandî “rahmeten li’l-’âlemîn”
Hem ji ins û hem cinan ra ecme‘în

Wan kutûbê ser resûla nazilîn
Tev bi navê wî Muḥemmed zeyyinîn

Çunkî navê wî bû mîzgîn şu‘le da
Herkesî zanîbû ew nav Eḥmeda

Hem işaret bû di feżlê wek heval
Lê belê zêde ji wana bê xilal

Ê tedebbur[5] lê nekir maye ḍelal
Ġeyrê ummeta Muḥemmed dîn zelal

Dîn ku hatî ew Resûlê pur mubîn
Ê ‘ezîz û hem şerîf û pur emîn

Gerçi gotin ehlê ‘ezman weṣfê wî
Kes ji wana negihiştî ‘ilmê wî

**r. 2.**

Ketne beḥsê enbiyayê muḥteşem
Cî neanîn weṣfê ẕatê muḥterem

Çunkî ew sirra sucûda Adem e
Ê ku bav e ew ji bona ‘alem e

Hem du‘aya wî ẕewatê pur celîl
Ê nebiy yû hem resûl û hem xelîl

Gotî Rebbî Tu bişînî yek resûl
Ew ji nava wan û de’wet bib qebûl

Da bixwîne ew ji wan re beyyinat
‘Ilm û ḥikmet jê bibînin mu‘cizat

Hem beyan ke wan kitabê pur ‘ezîz
Da şiyar bin ew bi qewlê pur lezîz

Tu ‘ezîz û hem ḥekîm û hem ‘elîm
Wî qebûl kir hem jî şandî ev kerîm

Gerçi ḥeqqê wî digotin ẓalima
Muşrikê cahil û kafir ‘alima

Dîn û mecnûn e heçî tiştê dibî
Bê esas û bê ḥeqîqet wek ṣebî

Lê Xuda jî ew temîz kirye ji wan
Wî hevalê hûn dibêjin ê cuwan

Ne ku dîn e ew resûlê Rebbê ‘erş
Jêrê destê wî ji ‘erşa ta bi ferş

Hem bi ‘umrê wî qesem kirye celîl
Bik tedebbur ya ḥebîbî ya delîl

Serxweş û e‘ma dibêjin ew temam
I‘tibar nîne bi qewl û hem meqam

Hûn bizanin ewwelê mexlûq ew e
Şu‘ledarê kainata her ew e

[5] **Tedebbur:** Raman, tefekkur

**r. 3.**
'Ezmiyet da ê qezenc kir ew ciwan
Hem muqeddem[6] bû di rutba pur giran

Eqd û mîs̱aqê ji wan xwestî Rehîm
Nûh û İbrahîm û Mûsa wan Kerîm

Hem ji 'Îsa ew resûl e wek hilal
Ê ku çêbû ew ji Meryem pur delal

'Eynê e'yanê wucûdê her ew e
Nûra erḍ û hem sema jî tim ew e

Ê ji bona 'arifîna merkez e
Ê di emrê Rebbê 'alem dibeze

Fexr û teşrîfa qezenc kir pur 'eceb
Ê şerayi' xetma wan re ew sebeb

Hem bû xetma enbiya û murselîn
Hem şefî' bû ew ji bona muẕnîbîn

Ehle îman pê mûferreḥ bûn temam
Ḥikmet û te'ẓîm di wî da dîn dewam

Jêr beyan kir wî Xudayê layezal
Ehlê kufr û wanê muşrik hem żelal

Tu bizane kes ji wan nabe heval
Ḥetta sozkê tu bi wan dî pur zelal

Weqta wan dî ku ji wan re nîne ziyan
Tiştekî 'aciz nebînin ḥal beyan

Hema teslîm ew ji ter bin hem selam
Tevli 'işret hem xiṭab û hem kelam

**r. 4.**
Ṣaḥibê tesrîḥ[7] û ḥuccet hem beyan
Ehlê 'eql û ehlê zana ê ji van

Wan di xwestî ku ji wî fehmdar bibin
'Eqlê zêde jê hilînin 'alim bibin

Hem jî jêr got wî Xudayê pur Reḥîm

Ê xebîrê ḥalê herkes hem 'Elîm

Kê ẓulum kirye li nefsa xwe`y şîrîn
Ji gunaha wî beden kirye birîn

Ṭirs û heybet ketye qelbê wî ji min
Xwestî 'efwa wan gunahê xwe ji min

'Efw û istixfar te xwestî jêr hema
Tê binêrî qeṭ li ser tiştek nema

Ruhniya çavê xerab û 'aṣiya
Tu gihîştî wan meqam û wan ciya

Ku tu nêzîk bû ji Ḥeq ra pur gelek
Ya Ḥebîbê wî Xudayê neh felek

Qabê qewsan[8] hê jî nêzîk tu dibû
Çawa xweste çav bi dînê ruhnî bû

Soz û 'ehdek wî ji te`r dabû qewî
Ji 'eṭa û ji riża tev bûn ji wî

Ma tê çawa tim ji bîr kî vanê delal
Ê ku medḥê wan ji ter ava ẕelal

Vanê qelbê xwe ji te`r kirne birîn
Tim jî 'aşiq ev ji te`r ya pur şirîn

Tu yî melḥûẓ hem jî merfûd bo Xuda
Can û ḥalê me ji ter daîm fida

Te bişîne wan meqamê meḥmûd kirî
Wan menazîlê Xuda teşrîf kirî

**r. 5.**
Te ḥeyake her bi te'ẓîm û surûr
Bi 'eṭaya wek biḥûra pur bifûr

Te risalet daima teblîġ dikir
Te emanet her wiha edda dikir

Te 'ibadet ji Xudê`r gellek dikir
Mal û serwet pur d`xeyrê telef dikir

Keşfa ġemmê te hilanî zail dikir

[6] **Mûqeddem:** Pêşîn
[7] **Tesrîh:** Ravekirin, raberkirin
[8] **Qewsan:** Nabêna herdû birûyan.

Te Xudayê xwe bo wan şîrîn dikir

Tim neṣîḥetkarê ummet bê ḥisab
Te ji wan re têr digotî ê s̱ewab

Pur qezenc kir ji Xuda feżla ‘eẓîm
Pur ji xulq û hem ji ṭeb‘ê pur selîm

Ê di ṣidqê pur muṣeddeq tim tu wî
Xurşê we‘d û hem emîn jî ew tu wî

Me‘dena cûd û sexayê tim dibî
Ummetê ra çavê ruhnî tu dibî

Hem ji ummeta żeîf ra raḥim î
Zêde bavê pur şefeqtir qaim î

Çi teḥiyyat û berekkat ku hebin
Tim û daim tev li ser ẕatê te bin

Got Xudayê me`y ‘eẓîm û pur ‘ezîz
Me ji nefsa we ku şandî ev temîz

Ew resûl e hem reûf e pur ḥelîm
Hem kerîm û ew ji mu᾿min ra reḥîm

*Kê (ku)guhdar ê nebûn qewlê te ye*
Nîne ḥewce her Xuda kafî te ye

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat ji qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**r. 6.**
**Fesla Duduyan Di Beyana Fezla Mewlûda Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**
Got Ebûbekrê ku ṣiddîqê Xuda
Kî li mewlûda nebiyyê Eḥmeda

Ku ji malê xwe wî serf kir dîrhem e
Ew refîqê min di cennet bê xem e

Gotî ‘Umer ê xelîfê Eḥmed e
Ê ku te‘ẓîm kirye mewlûd bê ḥed e

Tu ḥisab ke wî ḥeya kir bi yeqîn
Bi xwe Îslam hem jî vî dînê mubîn

Gotî ‘Usman wî xelîfê pur ḥeya
Ê ku qedrê wî mezintir ji çiya

Ê ku meṣref kir li mewlûda nebî
Da bixwînin ew di xêrê da dibî

Wek hevalê ḥaḍirê Bedr û Ḥuneyn
Fehm bikin hûn ey hevala bi yeqîn

Got ‘Elî ê ku zavê peyġember e
Tim riżaya Rebbê ‘alî li ser e

Ê sebeb be hem bi te‘ẓîm û surûr
Ew ji ehlê cennetê ye bê qusûr[9]

Ew ji dunyê bê îman dernakevî
Guh bidêrin ehle hażir hûn li vî

Hatî gotin ev Ḥesen Beṣrî dibî
Mis̱lê Uḥḥud ger ji min ra zêr hebî

Min dixwestî ez temam ṣerf jî bikim
Xwe di xêr û pur s̱ewabê da bikim

**r. 7.**
Ser bixwînin mewlûda qedrê giran
Guh bidin hem yeqîn kin ya biran[10]

Got Cuneydê ê li Beġdad ew dibe
Ew kesê hażir e li mewlûdê bibe

Pur bi qedr û hem bi te‘ẓîm û heval
Ê xelaṣ ke ew ji xwe`r îmana zelal

Gotî Me‘rûfê ji Kerxê ew humam
Ew kesê hażir bike hinik ṭe‘am

Da ku mewlûdê bixwînin ew li ser

[9] Di destxeta Mela Elîyê Baqustanî de cara pêşîn ev malikê wiha ye:
*Ê sebeb be hem bi te‘ẓîm pur ‘ucab*
*Ew ji ehlê cennetê ye bê ḥisab*
Paşê dîsa wî bi xwe sererast kiriye û weke li jor nivîsiye.

[10] *Ser bixwînin mewlûda Eḥmed ḥebîb*
*Di riya wî Rebbê ‘alem hem mucîb* (Qoxî)

Hem jî bînin hin ji nasa wan li ber

Bi ciyê ruhnî bi qewlê xweş lezîz
Hem bi libsê pur temîz bi ew ‘ezîz[11]

Wê di ḥeşrê ew bi firqa ewwelîn
Ew hevalê enbiya û murselîn

Ew di cennet da di qesrê ‘illiyîn
Ey hevala guh bidêrin pur yeqîn[12]

Got îmame pur ‘elîm û hem weḥîd
Ê di wexta xwe de yek bû hem ferîd

Fexreddînê Razî bû ew qenc edîb
Ê bixwîne mewlûda Eḥmed ḥebîb[13]

Xwê be ya genim ya tiştek ṭe‘am
Ser bixwîne mewlûda şîrîn kelam

Wê bereket têkev wana bê ḥisab
Hem ji tiştê têkev wana bê ‘itab[14]

Hem di cezb û iżṭirabê naseknî
Da ‘efûkî ṣaḥibê qelbê denî

Ger bixwînin wê li ser ava ẕelal
Ê ji wê avê vexwu ey qenc heval

**r. 8.**
Dê ḥezara ġiş ji qelbê derkevî
Hem ḥezara nûr û reḥmet têkevî

Roja qelbê pur xeraba dimirî
Qelbê wî ṣaġlem û ṣaġ e namirî

Ger bixwînin wî li ser hinek ṭe‘am
Yan li ser hinnik pera jî bê kelam

Wê bereket têkev wana pur ‘ecîb
Qet feqîr nebe xudiyyê pur edîb

Got îmamê Şafi‘î ê reḥme lê
Ê ji nasa kom bike yek menzilê

Go bixwîne wî li ser hinik ṭe‘am
Bi bixûr û bi civata xweş meqam

Baxuṣûṣa ew sebeb bî hem jî xwedî
Ferqê naxe nav kesan de ê ku dî

Wê di ḥeşrê ew di nêva ṣiddiqîn
Enbiya û şûheda û ṣalihîn

Wî di cennet da bi wan re tim muqîm
Di ciyê pur xweş bi nav cennet ne‘îm

Hem jî gotî wî Surriyê Seqeṭî
Reḥme lê be qeṭ nebîne meşqeṭî

Ê bi qeṣda wê ciyê mewlûd heye
Hem ṣelat û hem selam xwendin heye

Ew ji bo ḥubba nebiyyê kerîm û muḥterem
Wî ḥebîbê pur sexiyy û muḥteşem[15]

Çû bi qeṣda ew li wê guhdar bibe
Bi ṣelat û bi selama keyfxweş bibe

Ew cî jê re di ḥisab de cennet e
Lew meḥebbet pur ji wî ra himmet e

**r. 9.**
Ey hevala hûn yeqin kin ew merev
Wî qezenç kir cennet û hem pur şeref

Ewê sulṭanê ji bona ‘arifîn
Di kitaba xwe`y wesail wî emîn

Her ciyê mewlûd bixwînin ew meḥel
Ya di xanî yan di mescid bê xelel[16]

Pur melaîk bi ṣelat û bi selama kom bibin
Dê li ser wan nûr û reḥmet pur bibin[17]

---

[11] *Bi ciyê ruhnî bixûr û bi ‘ezîz*
*Ew bi libsê pir sipî û hem temîz* (Qoxî)
[12] *Ew di cennet da di qesra ‘illiyyîn*
*Ew di nava hûr û xilman bi yeqîn* (Qoxî)
[13] *Fexreddînê Razî bû ew qenc edîb*
*Ev di gotî wî bi qewlê xwey xerîb* (Qoxî)
[14] Hem ji tiştê ew di nav kev bê ‘îtab (Qoxî)

[15] *Ew ji bo hubba nebiyyê muhterem*
*Wî hebîbê kû sexiyy û pir kerem* (Qoxî)
[16] **Bê xelel:** Bê kêmasî

Ew melaîkê muqerreb ku hene
Ê bi nûrê ew muṭewweq[18] bi xwe ne

Ê dixwînin pur du'a û pur ṣelat
Hem dixwazin ew ji 'efwa seyyiat

Hem dibêje ewê, 'alemê ḥebîb
Ewê soza wî qewiyy û hem qerîb

Ew Celuddînê Suyûṭî[19] ku hebû
Ewê ḥikmet hem ḥeqîqet jêr hebû[20]

Ê li mala xwe bi xwîne mewlûdê
Hem bi te'ẓîm qedr û qîmet ew bidê

Wê Xuda jî ser hilîne êş û bela
Hem ji ġerq û çav xerab û hem ġela

Wê suala meleka jêr sehl bibe
Hem bi serbest hem jî bê ġem ew dibe

Di mekanê ṣiddiqîna ew delal
Nêzî Rebb û wî kerîm ê mûte'al

Ê ku xaṭir ew ji mewlûd ra bike
Ew di xeyr û pur s̱ewabê xwe dike

Guh bidin van tiştê got min ev bes e
Ne ku te'ba me ji wer bib 'ebes e

**r. 10.**
Qelbê 'aṣî qelbê ṭarî nexweş e
Qeṭ bi we'ẓ û bi neṣîḥet nab geş e

Ji Xudayê xwe`y kerîm hêvî dikin
Em dewamî mewlûdê te'ẓîm bikin

Tu bi ḥeqqê wî nebiyyê Muṣṭefa
Wî ḥebîbê te bi qîmet pur wefa

Tu 'efû kî me hevalê hażirîn
Tu Xuda î hem tu rebbê 'alemîn

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji 'ezab*

**Fesla Sisêyan di Behsa Hinik Gotin û Meqalatê Muhemmedu'l-Mustefa (sellelahû 'eleyhî we sellem) de ye**

Rawî gotî (ew) Enesê Malik e
Tim Xuda wî di rижayê da bike

Got Resûlê ew ji me`r peyġember e
Ê ku qewlê wî ji me`r mu'teber e

Ê di weqta behs̱ û ḥeşrê derkevin
Kes ji turba berî min dernakevin

Ê li pêşya wan di rê de tim ez im
Rehberê wan di sukûtê her ez im

Xwedyê mizgîna bi qewlê xwe`y refî'
Hem di weqta ḥebsa wan de ez şefî'

Miftê xeyrê tim bi destê min dibin
'Izz û îkram tev ji min re wê bibin

**r. 11.**
Ekremê ewladê Adem giş ez im
Lew di emrê Rebbê xwe de dibezim

Lê ji min ra wê ḥezar xadim hebin
Wek yeka yek lu'luê mens̱ûr[21] bibin

Gotî rawî wî Cubeyrê Muṭ'ime
Tim Xuda rażî be jê bib bê ġem e

[17] *Pir melaîk bi selata tê kom dibin*
*Dê li ser wir nûr û rehmet pir bibin* (Qoxî)
[18] **Mûtewweq:** Dorpêçkirîn
[19] Navê wî 'Ebdurrehman b. Ebî Bekr b. Mûhammed b. Sabiq el-Xudeyrî el-Esiyûtî ye. Bi navê Celaleddîn meşhûr bûye. Di sala 1445ê li Asyêtê hatiye dinyayê di sala 1505a li Qahîreyê wefat kiriye. 'Alimekî mezin ê tefsîr, hedîs, tesewifê bûye. Di mijarên dînî de gelek berhemên wî yên navdar hene. Tefsîra Celaleyn û berhema hedîsê Camî'ussexîr, ji berhemên wî yên meşhûr in (Özkan, 2003, r. 192-198).
[20] *Ew Celaluddînê Sûyûtî ê kerîm*
*Ê bi hîkmet hem heqîqet bûye 'elîm* (Qoxî)
[21] **Lu'lûê mensûr:** Durrên belavkirî

Got Resûlê ê kû nav jêr pur dibin
Pur ṣelat û hem selam ser wî bibin

Ez Muḥemmed hem jî Eḥmed ey heval
Hem jî masî[22]ê mehû ke kufr û delal

Ez im ḥaşir wexta ḥeşra xelqê bibe
Ew li cem min hem li qarşî min dibe

Ez im ‘aqib ji nebiyya kî ku hebî
Wê li pey min hem resûlê ku hebî

Ez muqeffa[23] hem Nebiyyê tewbet im
Tim ji ummet ra delîl û reḥmet im

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Çaran di Behsa Hinik Ewsaf û Şemailê Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem)**

Ê di gotî wî ‘Eliyyê Ḥeyder e
Tim riżaya Rebbê ‘alî li ser e

Got Muḥemmed ew bi bejnek pur şerîf
Ew ne kin bû ne dirêj û ne że‘îf

**r. 12.**
Ew bi mill û hem bi çokê baş dirêj
Qeṭ di wî de ji quṣûra tu nebêj

Ser û rihê wî dinêrî pur temîz
Hem bi quwwet hem jî xweşşik ew ‘ezîz

Lê tu meşya wî dinêrî pur ‘eceb
Tê ji ber piyyê mubarek terpereb

Ewwelîn û axirîna nebe yek
Qeṭ ji nas û ji hevalan tu kesek

Di ser û hem rihê wî de nozdeh hebûn
Ji mûyê sippî mubarek neh zêde bûn

Ew bi rengê xwe ji xelkê zêde bû
Wek gula ṣora ku nû bû vedibû

Mûyê nûranî ji ḥusnê pur beha
Ew dirêj bû nûr dihatin nav guha

Hem di wechê wî de tedwîrek[24] hebû
Pur sipîyy û hem bi ṣor ve gul dibû

Poz biçûk û çav û birhê bi kilî
Xerza şaşê tê ye nava du milî

Ew e xatem bû ji bona nebiya
Hem ‘elamet bû ji bona sexiya

Eṣdeqê nasa temama bi ziman
Hem jî mêrxaṣî ji herkes di zeman

Ekremê nasa temama ji neseb
Ê ku dîbû ew dibêje pur ‘eceb

Her kesê ku pêr heval bû ew dibû
Purî me‘rîfet û zana pê dibû

Çi kesê ku ew dibêje weṣfê wî
Me ji nasa kes nediye mis̱lê wî

**r. 13.**
Ev riwayet ya dibêje ‘Aişe
Ya ku bavê wê ji dîn re padişe

Tim riżaya Rebbê ‘Alî bit–temam
Weku barana bi mezz û bi xumam

Gotî wek yek ew ji nasa kar dikir
Pîna ṣolê wek dirûna cillê dikir

Ev riwayeta Eness e ew dibê
Wî ṭe‘amê ku dimîne nahêl ṣibê

Her çi tiştê xaṣê Peyġember dibin
Çi fežaîl çi keramet ku hebin

Yek ji wana adem û mexlûq temam

[22] **Masi**: Guneh, ‘isyan.
[23] **Mûqeffa**: Pêşewa, pêşeng
[24] **Tedwîr:** Nûr, rewnaq

Xulqa wana tev ji bo ẕatê humam[25]

Ew di êvara ku birçî tî dibû
Hema ṣubḥê têr û tijjî ew dibû

Rebbê ʻalem wî ji cennet têr dikir
Ew bi av û hem b`xwarin niʻmet dikir

Ê ji paş tê wî didîtî nas dikir
Hem şeva ṭarî ji wîr[26] ruhnî dikir

Ger li ʻerḍa nerma axê bimeşî
Şopa linga ne xûya ye bi xweşî

Lê li ʻerḍa hişk û kevir ku here
Şopa wî ẕatî xuya bî li ser e

Ew ji nav ʻalem temam neqandiye
Hem ji nava wan temam ew ṣafiye

Ḍew û sîne ger ji çehv re ku hebûn
Lê ji qelb ra qeṭʻî sûret tunebûn[27]

Ew ku xwêydana ji miskê xweştir e
Hem ji bêhna ṣorgulê ew bêhntir e

**r. 14.**
Ew bi bejnek pur leṭîf û hem şifaf
Sî li ber bejna wî nabe qeṭ li ṭav

Yek ji mêş û moziyata kes nedî
Ku li canê wî mubarek bû xwedî

Pur melaîk tim û daim pêr hebûn
Emma ġalib ew li piştî wî dibûn

Hem ji wacib tim ṣelata ser bidin
Da ku ʻaşiq tim ji ḥubba wîr bibin

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*

*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ʻezab*

**Fesla Pêncan di Behsa Hinek Muʻcîzat û Wan Tiştê Ku Xasî Muhemmed Mustefa(sellelahû ʻeleyhî we sellem) de ye**

Enbiya ra muʻcîzat ê kû hebûn
Ew temam jî xaṣê wexta wan dibûn

Ji Resûlê me Muḥemmed ra çêdibin
Ew dewamî tim û daim ê hebin

Muʻcîzatê wî hebûne bê ḥisab
Lê yeka yek kî dibîne pur ʻucab

Pur ṭeʻama wan di dest'd tesbîḥ dikir
Ḥażirê wir kî hebûn deng jê dikir

Rawiyê got ew Buxarî ku hebû
Ji ḥedîs̱a İbni Mesʻûd ev dibû

Me Muḥemmed ra ṭeʻamek ku dixwar
Dengê tesbîḥa dihatî aşikar

**r. 15.**
Hem jî sirrek pur ʻeẕîm e lê binêr
Ku selama kevviran wan lê dikir

Wekî gotî wî nebiyyê pur şerîf
Ku selam kir wî kevirê pur żeʻîf

Hem neha jî wî li Mekkê nas dikim
Wî bi ʻizz û bi şeref qiymet dikim

Hem ji rawî tev yeqîn kin ey bira
Ji kelam û hem selamê dar û bera

Got ʻEliyyê Murteża yê Ḥeyder e
Tim rižaya Rebbê ʻAlî li ser e

Ku li Mekkê ez Muḥemmed ra ku diçûm
Dora Mekkê wan newalê tê dibûm

Di çiya de wan kevirê ku hebûn
Di Muḥemmed ra selamkar tev dibûn

Ba surûr û hem bi şîrînê kelam

---

[25] **Humam:** Xwedan himmet, pêxember
[26] **ji wîr:** Ji wî re
[27] *Xew û xeflet ger ji çe'v re ku hebûn*
*Lê ji qelp ra qet'î sûret tunebûn* (Qoxî)

Ya Resûlullah digotin es–selam

Hem ṭe‘amê xweş û hindik pur dibû
Kû du‘aya wî mubarek jêr dibû

Bi du‘aya wî mirî jî saġ dibûn
Bi kelam û hem bi ṣuḥbet pêr dibûn[28]

Wekî gotî wî Imamê Qurṭubî
Ew di cennet ba surûr û bê ġem bibî

Da û bav û Ebû Ṭalib ku hebûn
Piştî mirna wana dîsa saġ dibûn

Ew muşerref bûn bi îmana ẕelal
Lew xelaṣ bûne ji kufr û hem ḍelal

Hem bi emrê iştigalê serbest dibûn
Wan biçûkê ku li dergûş hîn dibûn

**r. 16.**
Hem şehadet jêr dibêje yek ṣebî
Tu nebiyyî hem resûlê şakirî

Şêst û sê sal ‘umrê wî jî ev dibû
Hem nubûwwet di çilî de jêr dibû[29]

Xiẕmeta wî ji Xudê ra ku dikir
Ji Nebiyy û ji Resûla kes nekir

Rebbê ‘alem pur didayê mu‘cizat
Hem jî xaṣ kir ku didayê beyyinat

Hem dibêjin mu‘cizat ṣed bûn temam
Ev in meşhûrê di nava xaṣ û ‘am

Ġeyrê vana dûwazde dî jî ku hebûn
Ew temamê xaṣê mala wî dibûn

Çunkî ev dana Xuda ye jêr dikir
Ji nebiyy û murselan ra kes nekir[30]

Ez nikarim van beyan kim bi kitab

Wê dirêj be ev kitabet bê ḥisab

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birin

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘eza*

**Fesla Şeşan Di Behs Xwestina Amîne ji ‘Ebdûllah re bavê Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Gotî Eḥmed kurê Ḥesen Bekrî ye
Nûr û reḥmet tim li ser ruḥê wî ye

Xwestî Rebbê me ‘eẕîm û ẕulcelal
Wî Xuda yê nav kerîm û mûte‘al

**r. 17.**
Neqla nûra wî Muḥemmed da bike
‘Erḍ û ‘ezmana ji wî tev nûr bike

Xistî qelbê ‘Ebdullah ê Muṭṭelib
Çêbû jê re fikr û ġemmê murte‘ib[31]

Ku bizewce xwe xelaṣ ke ji ‘itab
Çunkî ṭalib jêr dibûn jin bê ḥisab

Got ji daya xwe[32] bi şîrîn û delal
Tu bixwaze zewcekê bi ḥusn û cemal

Bi beha û qedd û qamet i’tidal
Hem ji mala pur şerîf û ‘eql û kemal

Wê dixwestî hem bi ‘işqê radibû
Nav qebîlê Qureyşiyya kar dibû

Dîtî Amîne ji nava wan temam
Pur bi ḥusn û hem bi ‘eql û şîrîn kelam

Gotî dayê rabe dîsa mêze bike
Li quṣûr û di ‘uyûba teftîş bike

Dîsa rabû dîtî ya kewkeb[33] misal
Nîne wek wê kes di ḥusn û ji heval

[28] Yanê pê re diaxivî û suhbet jî dikir.
[29] *Şêst û sê sal ‘umur jê re bû xelat*
*Ew nubûwwet di çilî da jêr dihat* (Qoxî)
[30] *Ev ‘eta a ku Xwedê jê re dikir*
*Ji Nebiyyû Murselan re qet nekir* (Qoxî)

[31] **Murte’ib:** Bi tirs
[32] **Daya Xwe:** Diya xwe
[33] **Kewkeb:** Stêrk

Rabû xwestin ṣerf kirin malê delal
Li wê qîza misḻê rojê yan hilal

Wan weqiyek[34] zêrê xaliṣ pur temîz
Hem weqiyek zîvê xaliṣ pur 'ezîz

Ṣed dewar û ṣed dev û pez jê wiha
Kirne nextê[35] Amîne`b qedrê beha

Ji ẕebîḥ û ji ṭe'ama gellek kirin
Ji feqîr û ji ġeniya ser kom kirin

Pur meṣarif bû ji bona de'wetê
'Ebdullah zava ye çûye xelwetê

**r. 18.**
Wê şeva de'wet ku tê da xweş dibû
Pur bi kêf û hem bi şahî cum'e dibû

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji 'ezab*

**Fesla Heftan di Behsa Hemla Amîne bi Muhemmed Mustefa (sellelahû 'eleyhî we sellem) de ye**

Gotî rawî ê bi qewlê mu'teber
Beḥsa xelqa wî nebiyyê muftexer

Hatî wexta bîn ẓuhûrê Rebbê reḥîm
Nûra Eḥmed wî resûlê pur kerîm

Wê şeva înê me got nehê receb
Guh bidin tiştê ku çêbû ji 'eceb

Emrê Riḍwan wî kirî xazin[36] cinan
Vekke Firdewsa ku xweştir ji beyan

Bike gazî tu li ehlê erḍ û sema
Da şiyarbin ins û kainat hema

Nûra mexzûn[37] hem jî sirra bê quṣûr
Wê ji wê xelqa Muḥemed bê ẓuhûr

Wê di betnê Amîne ew çê bibe
Wê kemala xelqa wî jî tê bibe

Wê xurûca wî ji başa re beşîr
Ji xerab û ji uṣata[38] re neẕîr

Ev ḥedîs̱a Ibnî 'Ebbas apê resûl
Tev yeqîn kin hem bi te'ẓîm jê qebûl

**r. 19.**
Got delala tê ji ḥemla Amîne
Ê ji bona wî zewatê şîrîn e

Purî ḥeywanê Qureyşa wê şevê
Kirne gazî wan bi ṣewt û bi devê

Ew bi Rebbê Ke'b û 'ezman ḥemle bûye
Ji nişanê wê şeva xulqa wî ye

Text û qeryolê mulûkan qellibîn
Şah û sulṭan tev di wê da ḥeyyirîn

Hatî şeyṭanê mezin iblîs le'in
Pur bi qîrîn û hewara derd û birîn

Ser çiyayê bû Qubeysê zarezar
Ser serê xwe toz û dûman kirye xwar

Purî şeyṭana li dorê kom dibûn
Ji vê ḥuznê ew bi hev meşġûl dibûn

Ev çi ṭirs û ev çi ḥal e bêj ji me`r
Go çi bêjim qeṭ nema ciyy û qerer

Çunkî hatî dewleta xûnrêj siqak
Em ji destê wî hemî tev bin helak

Hat hilaka me di wexta çêbû ḥemel
Bûye i'lan hem jî meşhûr nav milel[39]

Di Mekkê da çiqas qîz jî tê hebûn

[34] **Weqiyek:** Ji pîvana giraniyê ye, ji nîv kîloyî kêmtir e
[35] **Next:** Qelen
[36] **Xazin:** Dergevan

[37] **Mexzûn:** Gencîne
[38] **Uṣat:** Gunehkar
[39] **Milel:** Pirjimariya millet, netewe

Ji ġemê xwe ji ḥesed meḥzûn dibûn

Wek dibêjin ṣed temamî jê mirin
Ji ġem û derdan ḥeyat wenda kirin

Maye ‘Ebdullah di xilwa ṭa‘etê
Nûr û rewneq bû di nava cebhetê

Ṭeyr û weḥşî pur ji hev ra mizgîn didin
Bîhara ehlê wê der ‘ilmdar dibin

**r. 20.**
Her serê mehkê ji ḥemla wî dihat
Deng ji erḍ û hem ji jora semawat

Dabû mizgînî ji xelqê’r her weha
Ew Ebu`l Qasid bi qedrê pur biha

Bê ẓuhûrê ew li ‘erḍê bi xwe ye
Ew şeva tarî li we ruhnî bûye

Nav Muḥemmed hem jî Eḥmed ew ẕewat
Pur ṣelat û pur selam û berekat

Ṣubḥ û êvaran bibarin weqt û zeman
Ser Muḥemmed wî resûlê îns û can

Ev riwayet ya dibêje ‘Aişe
Diya mu’min mu’minat û ṣalihe

Go di wî weqtî yehûdiyyek hebû
Ew yehûdî di Mekkê da meşhûr dibû

‘Eynê ew şev ya ku mewlûd tê dibû
Ji suala Qureyşiyya meşġûl dibû

Go ji wer îşev da zarokek ma bûye
Em nizanin da bipirsin belkî bûye

Go binêrin lê muḥeqqeq ew çêbûye
Tev bizanin ew resûl û hem nebî ye

Ê ku muhr û hem ‘elamet nav mil e
Ê bişewṭe tim li ser wî qelb û dil e

Çûn Qureyşî bû sûalê kin ji wî ye
Dî ku rast e ew ‘elamet bi cî ye

Ew yehûdî rabû çûbû mêze bike
Da bi çavê xwe bibîne yeqqîn bike

Weqta çûbû dî Muḥemmed bi nişan
Ketye ‘erḍê di wê weqt û hem mekam

**r. 21.**
Weqta rabû bi hişyarî gotibû
Ew nubuwwet îsraîl de ku hebû

Ew ji nava wan neha radbe diçe
Deng û seṭweta[40] Qureyşiyya afaq biçe

Ev ḥedîsa İbnu ‘Ebbasê pur ‘elîm
Jê be rażî ew Xudayê pur Kerîm

Gotî Amîne di weqta borî li min
Hema şeş meh bû temama ḥemla min

Hatî ẕatek got di xewnê da ji mi`r
Hem bi ṣuḥbet hem bi şîrîn da emir

Ew resûlê Rebbê ‘alem ḥemla te ye
Nav Muḥemmed ew j`ruḥ û canê te ye

Weqta çêbû ew ji ter mektûm[41] bike
Hem ji herkes tu vî navî mestûr bike

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Heşta di Behsa Ixbarekê de ye ji Wan Mu‘cîzatê ku Xasî Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Hem di ixbarek dihatî ev meqal
Guh bidin van tiştê gotin ey heval

Weqta xwestî wî Xuda yê pur celîl
Bên ẓuhûrê xeyrî xelqê ê delîl

---

[40] **Seṭwet:** Qedir, qîmet
[41] **Mektûm:** Veşartin

Ê ṣefiyyi ji ʻibad û hem ji xelqê bit temam[42]
Ê ku erḍê bike ruhnî ji ẕulam

**r. 22.**
Ku temîz û purî ṭahir ke bi kerem[43]
Jê hilîne her çi meʻbûd wek ṣenem

Ê ku ṭawûsê melaîk Cibrîl Emîn
Kirye gazî li sema û ereḍîn

Hem li cem wan ḥamilê ʻerşê Xuda
Hem li cem wî Sidreta a Munteha

Hem di cennet ya ku mewa ye dirêj
Deng hilanî wî bi ṣewta xwe`y dibêj

Wî Xudayê ẕulcelal û pur kerîm
Hatî weqta weʻd û soza wî qedîm

Ḥikmeta wî jî ẓûhûr ke ê bişîr
Ê sirac û hem şefîʻê yewme`l-ʻesîr[44]

Amirê meʻrûf û nahyê munkera
Ṣaḥibê dîn û ʻedûwwê kafira

Ê mucahîd bi ṣiyanet[45] bo Xuda
Xeyrtirê xelqê li erḍê nûr veda

Ê ku xatem bû ji bona nebiya
Xwedyê reḥmê hem şefîʻê ʻaṣiya

Nav Muḥemmed hem jî Eḥmed ew Kemal
Hem jî Ṭaha hem jî Yasîn pur delal

Ew e ê dîn ku beṭal bûne bo wî
Hem şerîʻeta nebiyyan weke wî

Hema tesbîḥ wan melaîk pur kirin
Ji s̱ena û zêde weṣf û ḥemd kirin[46]

Hema deryê wan cinana tev vebûn
Hema deryê akaran[47] jî girtibûn

Ṭerr û nazik bûne darê cennetê
Ḥûr û ġilman radibûne xizmetê

**r. 23.**
Gul û reyhan hem nebatatê gelek
Bêhna wan û hem ji firdews çûn felek

Ṭeyr dixwûnin bi luġatê muxtelîf
Hema derbûn çem û kanîyyê neẓîf

Çemmê av û çemmê şîr û hingivîn
Çemmê raqî ê vexwarî zewq dibin

Ṭeyr dixwûnîn ser guliyya bi xweşî
Ê ku guhdar ew dimîne bê heşî

Ew Xudayê pur ʻeẓîm ra tewḥîd dikin
Hema teqdîsa weha wiha zêde kirin

Hem di cennet da melayîk pur deng didin[48]
Bi Muḥemmed Miṣṭefa jî mîzgîn didin

Hem tecelliya ʻeẓîmê ẕulcelal
Her ṭeref wî kirye ruhniyy û şemal

Ew Xuda yê bê şerîk û bê mis̱al
Hem jî keşşafê kurûba[49] layezal

Hucbû estar[50] wî hilanîn wê demê
Kir Xudayê bê şerîk keşfa ġemê

Pê şiyarbûne melaîk hem jî ġulam
Çawa teblîġa sema kir ew bû temam[51]

Emrê Cibraîl kirî Rebbê mezin[52]
Gotî dakev nava erḍê rak ḥezin

---

[42] Li gorî pîvana mewlûdê ev riste çar kite zêde hatiye nivîsîn.
[43] *Hem temîz û pirî ṭahir bi kerem* (Qoxî)
[44] **Yewme'l-ʻesîr:** Roja tengasiyê
[45] **Siyanet:** Parastin
[46] *Hema fil ḥal pur melaîk tesbîḥ kirin*
*Ji s̱ena û wesfê ḥemdê zêde kirin* (Qoxî)
[47] **Akaran:** Ev bêje di nusxeya Qoxî de *agiran* e.
[48] *Hem di cennet da melaîk denk radikin* (Qoxî)
[49] **Kurûba:** Pirjimara kerbê
[50] **Hucbû estar:** Perde
[51] *Pê şiyar bûne melaîk îns û can*
*Piştî teblîxa temam kir wî zeman* (Qoxî)
[52] *Emrê Cibrîl ê Emîn kir Rebbê mezin* (Qoxî)

Ji melaîk ṣed hezar bûne heval
Tev bela bûne li deşt û hem cibal[53]

Di cezaîr di biḥar û hem xerab
Dane mîzgînî temama bê ḥisab

Ḥetta erḏê jêrî jêrî ew diçûn
Wan nehiştî cîk li erḏê kes hebûn

**r. 24.**
Kesê zanî ku Xuda jê ra qebûl
Ê ku ṭahir hem teqî be nabe melûl[54]

Ya Xuda yê pur kerîm û ẕulcelal
Me ḥisab kî ji qebûla hem jî heval[55]

Me û vanê ku li mewlûd ḥażirin
Da û bavê wana tevde ku mirin[56]

Tu bi ḥeqqê Miṣṭefayê pur ‘ezîz
Ji gunah û ji xeṭaya bikkî temîz

Hûn bixwûnîn pur ṣelata bê ḥisab
Ser Muhemmed wî Şefî’ê yewme’l-meâb[57]

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Nehan Dîsa di Behsa Hinik Xarîqe û Hem Ewsafê Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Ev riwayet Bû Hureyre ew dike
Tim Xuda wî di riżayê da bike

Ku suwal kir min ji ‘Elîyyê Ṭalib e
Pur riżaya Rebbê ‘alî ser bibe

Ji sifatê wî Resûlê mu‘teber
Ê ji erż û ji sema ra muftexer[58]

Ku resûl e ji Xudayê ‘alemîn
Ew e qaidê ji bona muḥeccilîn[59]

Ew ‘ezmana Nebî bû Adem ḥerî
Ji ‘iyûba ji quṣûra tev berî

**r. 25.**
Rebbê ‘alem di kitêba xwe`y mubîn
Wî digotî kainata`r ecme‘în

Ev Muḥemmed nabe bavê tû kesî
Da biçûk û hem mezin pê biḥesî

Ew Resûl û hem jî xetma Nebiyyîn
Hem ḥebîbê wî Xudayê pur mubîn

Ê ku ḥewżê kewṯerê ra amir e
Ê meqam ê Meḥmûd jê re esser e

Ew imam bû hem resûl bû Qureyşî
Pur ṣelata tim li ser wî bireşî[60]

Ew e beyreqdar di ḥeşrê ê bibe
Ê bi qîmet û bi xaṭir ew dibe

Ew nebiyyê Ḥeremeyna hem li dûrê fethiye
Ew Mekiy yû Medeniy yû ebṭeḥiyy e[61]

Eṣlê wî jî ademî bû insan dibû
Ji neẕar ra fer‘û mensûb ew dibû

Hem ji Îbrahîm Xelîlullah ḥeseb
Hem ji Îsma‘îl Zebîḥullah neseb

Ew bi şexṣê ‘elewiyy û bi nûra qemerî
Bi lisanê ‘erebiyy û bi rengê esmerî

Ew bi qelbê reḥmaniyy û hem pur ḥelîm

[53] **Cibal:** Çiya
[54] *Kesê jêra ku Xweda kirye qebûl*
*Ew teqiy ye ew di heşrê nabe melûl* (Qoxî)
[55] *Tû qebûl kî hem ji mer jî hem heval* (Qoxî)
[56] *Tevlî da û bavê sax û wê mirin* (Qoxî)
[57] **Yewme’l-meâb:** Roja vegerê

[58] **Muftexer:** Hêjayî pesinandinê
[59] **Muḥeccilîn:** Dest û rû spî
[60] *Ewe îmam û hem resûl û Qûreyşî*
*Tim selata pur li ser wî bireşî* (Qoxî)
[61] **Ebṭeḥî:** Navekî Mekkê ye bi me’na wê newalên tijî kevir e

Ew bi cih xwo Ḥicaziyy û hem pur kerîm[62]

Ew bi burhê hem zirav û hem dirêj
Dest û zer'ê wî yê qayîn mû dirêj[63]

Ew bi qama mu'tedil bû ne dirêj û ne kinik
Hem bi rengê ṣor sipiyy û pur xweşik[64]

Çav berraq û bi kanî kî kilkirî
Bi libasê pur temîz û hem jî ṭahir hilkirî

**r. 26.**
Ew di weqta ku ji meclis radibû
Da işaret ji hevalê ku hebû

Ew işaret bû ji bo rabin temam
Weqta meşyê ser dibû 'ewr û ġumam

Ew e ṣaḥib qabê qewsan û nebiyyê reḥmet e
Himmeta wî jî bilind û ew şefî'ê ummet e

Xwedyê nuṭq û hem beyana pur feṣîḥ
Ew ku xwêdana ji wî yê bêhn melîḥ[65]

Ẕikr û ixbarê ku jê tên bê misal
Ew bi xelqa hem bi xulqê pur kemal

Bi kelamê xwe şîrîn û wekî ava pur ẕelal
Teḥliya xwe nade kesî hem ew rifqê bê heval

Pak û paqij ew ji nûra Ẕulcelal
Di şeva ṭarî bi wechê wek hilal

Bi ḥicab bû bi dewamî mestûr dibû
Ew ji şeyṭan hem ji dujmin meḥfûẓ dibû[66]

Ruknê Îslam kê didîtî lêd`kir selam
Tim li ser bin pur ṣelat û hem selam[67]

Dînê baṭil wî hilanî ê pur xerab
Dînê Îslam wî beyan kir hem ê ṣewab

Pur fitûḥat û cihad jê re hebûn
Hema dewlet tev ji wî ra muṭi' dibûn

Ẕikr û tesbîḥ ji Xuda ra tim dikirî
Bi ḥeya û bêhnfire bû hem bikirî[68]

Ew bû xatem ji nebiyya hem emînê ji sema
Katimê sirra temama hem sexiyê bi 'eṭa

Başê tiştar[69] ne bexîl bû jê dida
Nava nasa ew ji qîmet deng dida[70]

**r. 27.**
Mu'cizatê purrî ẓahir jê beyan
Gur û hirça wekî wana îxbar didan[71]

Weqta mi'racê bûraqê ḥurmet dikir
Qeṭ di rê da çûbû hat û deng nekir

Pur 'esa kir jê vexwarin têr ji ava tilliya
Hem bi pê ket koka darê tevlî rah û gulliya[72]

Wî biçûkê jê biġur da tekellum bi xweşî
Ew di destê wî şerîf da bi heşî

Pur xeber dabû ṣebiyyê hîn li şîr
Murteḍayê tu ji Rebbê xwe`y kebîr

Soz û 'ehda xwe`r wefî bû ew kerîm
Hem riżaya Wî ra ṭalib bû ḥelîm

---

[62] *Ew bi nutq û bi beyan hem pur hekîm*
*Hem bi qelbê rehmaniyy û hem pur kerîm* (Qoxî)
[63] *Dest û zendê wî qewiyy û mû dirêj* (Qoxî)
[64] *Hem bi qamet ne dirêj û ne kinik*
*Ew bi rengî sipî sor û pur xweşik* (Qoxî)
[65] **Melîh:** Şîrîn
[66] *Tim û daîm bi hîcab û newbet dibû*
*Ew ji şeytan û 'edûwa mehfûz dibû* (Qoxî)
[67] *Kê didîtî kê diborî lê dikir selam*
*Pur li serbî hem selat û hem selam* (Qoxî)
[68] *Hem dewamî bi heya û pur girî*
*Bi dewamî zikr û tesbîh dikirî* (Qoxî)
[69] **Başê Tiştar:** Ji tiştên herî baş re
[70] *Pur biqîmet bû li erdê deng dida*
[71] *Mu'cîzatê wî yê zahir pur hebûn*
*Gur û hirçan wekî wana mûxbîr dibûn* (Qoxî)
[72] *Hem 'esa kir av vexwarin wan ji ava tiliya*
*Koka darê ew bi pey ket tevlî rih û guliya* (Qoxî)

Qeṣta jê re çi muhim bû jêr dibû
Satirê ‘ewret dewamî ḥafiẓ dibû

‘Efwa herkes ji xeraba tim dikir
Çi muṣîbatê[73] li ser xwe mestûr[74] dikir

Purrî rojê xwe bi rojî dibirî
Di şeva de pur ‘ibadet dikirî

Ji bo başa ew bi ‘ewnet[75] bê ḥisab
Purê fuccar û xerab dane ‘eẕab

Dest bi kê da wî bi sehl û bi xweşî
Pur ‘edalet ew di teqsîm dimeşî

Me‘mela de ew bi sebbaq[76] pur xweş î
Di ḥurubû xwedyê ḍerbê nexweş î

Bi tebessum ken ji wî re qeṭ tunebû
Ẕewq û raḥetî ra ṭalib ew nebû

Xwedyê ‘eql û hem feṣaḥet mewzûn dibû[77]
Tim li pêş bû hem bi qewlê ḥuccet dibû

**r. 28.**
Kî selam kir li wî ẕatê pur şerîf
Hem bi dest girt û hejandibû xefîf

Bêhna firdewsê ji destan pur xweşî
Kî binêrta ew diçûbû ji heşî

Weqta rûniştî li ṣeḥna mescidê
Wekî hîva pur bi şewq û nûr didê

Pur bi şewq bû ew ji nûra`b nubwetê
Jêr ‘elamet bû resûlê reḥmetê

Pur kerîm û hem qesîm[78] û hem wesîm[79]

Ew ji ḥusnê ra ‘elamet bû ḥelîm

Ew bi çavê reşkirîbû ku ji lêva nûr dibû
Nava milla muhra xetmê tê dibû

Ew kelîma lailahe ġeyrê ẕatê wî wucûb
Ev Resûllullah Muḥemmed qaṣidê wî yê meḥbûb

Ew li dunê nav Muḥemmed çunkî Meḥmûd ji Xuda
Cem melaîka temama ew wisa ne ey huda[80]

Ew beşîr bû cennetî ra mizgîn dida
Hem sirac bû ku ji wan ra ruhnî dida

Murteḍa ye wî Xuda rażî bike
Hem şefî‘e ummetê ra wî bike

Eşkera kir dîn bi ḍerbê xwe giran
Ew neṣîḥetkarê ummet bû ciwan

Çi ‘ibadet ji Xudê ra ku hebûn
Wî temam kir ḥetta rojê wî hebûn

Mewlûda wî duwazde ê Ewwel Rebî‘
Nav rebî‘ bû hem rebî‘ bû hem Rebî‘

Mu‘cizatê purrî ẓahir jêr dibûn
Jêr melaîk îns û cin muṭi‘ dibûn

**r. 29.**
Ew ‘elamet ji nebiyy û murselîn
Ji xelaṭa Rebbê ‘alem ev emîn

Ji temamê enbiya û murselîna zêde bû
Ji temamê mexlûqata yek bi xwe bû

Rebbê ‘alem me ‘efû ke ji ẕunûb
Me temama ew e keşşafê kurûb

Bi Muḥemmed Misṭefa ra yewmu`l–mezîd
Tev di cennet qeṭ ji cem wî nebne be‘îd[81]

---

[73] **Muṣîbat:** Pirjimara asiw, misîbet, bela
[74] **Mestûr:** Nuxumandî
[75] **Ewnet:** Alîkarî
[76] **Sebbaq:** Di her tiştî de xwediyê sereketiyê, di tevgeran de ji herkesî zûtir
[77] Di heman destxetê de di binê vê de wiha jî nivîsiye: *Xwedyê ‘eql û bi feṣaḥet mewzûn dibû.*
[78] **Qesîm:** Rind
[79] **Wesîm:** Zerîf

[80] *Nav Muḥemmed çunkî Meḥmûd ji Xweda*
*Ba melaîka temam jî ê huda* (Qoxî)
[81] *Tev di cennet saliḥa ra hem şehîd* (Qoxî)

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Dehan di Behsa Fedl û Xêra Selawatê Ser Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Ev ṣelatê ser Muḥemmed pur s̱ewab
Ê bi ‘işqê wê bixwîne cennet meab

Hem ṣelatê ser Muḥemmed di s̱ewab
Purî xêrtir ew ji ‘itqa[82] pur riqab[83]

Di zemanê ku Muḥemmed di Medînê da dibû
Çû żiyafeta ṣeḥab kî hażir dibû

Ew ji mescîd wexta rabûne diçûn
Wî ṣeḥabî gav jimartin ev dibûn

Di ḥisabê ku temam ṣed gav dikir
Wî ṣeḥabî ṣed ‘ebid az̠ad dikir

Ji s̱ewaba wî mezin ra beḥs̱ jê kirin
Hema meşhûr ew di nava xwe pur kirin

**r. 30.**
Got Resûlullah li wê der ev xeber
Ji ‘ebîda gerçi azad ew qeder

Li ṣelatê ku li ser min xêrtir dibin
Ew ji ‘itqa wan ‘ebîdê ku kirin

Pur xeber da wî di xêra ṣelewat
Tim li ser bin pur ṣelat û berekat

Gotî Muslim di Ṣeḥîḥa xwe`y şîrîn
Wî riwayet ji Hureyre ê emîn

Kî ṣelatkê ê bixwîne ew şad bibe[84]

Musteḥeqqê deh ṣelata ew dibe

Deh ṣelat jî bi ṣedî ne bil–temam
Ṣed bixwîne ew ḥezar in bi kelam

Ê bixwîne yek hezarî ew dibe
Dê bi min ra cennetê da pur xweş bibe

Gotî ‘Ayşe ya Xudê jê rażî be
Ji Muḥemmed ra ku zewcet dibe

Seḥerê da min ji wî ra cillek dirût
Çira vemrî derzî ketbû wê digot

Min dî daxil bû Muḥemmed ku dihat
Şewq û ruhnî da ji weché nûr hilat

Derzî min dî ji ‘ecêbê min digot
Çiqas wechê te bi nûr e wî digot

Weyl ji wî ra wî kesî ku min nebîn
Roja ḥeşrê purrî zeḥmet wê bibîn

Ya Ḥebîbî kî ye ew kes bêj ji me`r
Di cewab da go bexîl e ev qeder

Ya Ḥebîbî kî bexîl e got ew dibe
Ê li balê beḥs̱a min tê ġafil bibe

**r. 31.**
Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Yazdan di Behsa Ziyaretiya Enbiya Hem Selama Wan Li Ser Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Gotin ‘alim wan di ḥeqqê Muṣṭefa
Tim rižaya Reb li ser wan bê cefa

Çi mekanê ku bixwînin mewlûd li wê
Wê melaîk ḥetta salkê kom bin di wê[85]

[82] **‘Itqa:** Azadkirin
[83] **Riqab:** Kole, bende
[84] *Ê bixwîne yek ṣelatkê dilşad bibe* (Qoxî)
[85] *Ḥetta salkê wê melaîk naçin ji wê* (Qoxî)

Ḥetta roja hatî xwendin bi yeqîn
Ê dibêje ew ‘Eliyyê pur emîn[86]

Tu du‘a jê naçe ‘ezman nabe qebûl
Bê ṣelata ser Muḥemmed ew bit ẕelûl

Aminê got ez Muḥemmed ḥemle dibûm
Meha ewwel recebê da ez tê dibûm

Min ẕelamek di xewê da şîrîn didî[87]
Ew bi wechê purrî xweş û nûr xwedî

Merḥeba got ya Muḥemmed min digot
Çi kesî tu ez im Adem wî digot

Çi dixwazî gotî mizgînî te be
Ji beşer ra ev e seyyîd pê xweş bibe

Ev muḍer û hem rebî‘e ku hebin
Van qebîla ê bi wî teşrîf bibin[88]

Maha du wî xweş ẕilamek dî dihat
Ser Muḥemmed kir selam û mujde xelat

**r. 32.**
Çi kesî tu bêj xuyanî çi xeber
Ez im Şîs û di cewaba xwe ji mer

Çi dixwazî go ji te`r mizgîn didim
Ji vê ḥemla te`y bedî‘ ra şehde dibim

Ew ji te’wîl û ḥedîs̱a ra xwedî
Hem Beraḥîmê ku qaṭi‘ ḥuccet didî

Maha du wê min ẕilamek dîbû dihat
Kir selam û purrî ‘izzet jê dihat

Min dipirsî ez im Îdrîs di cewab
Gotî ḥemla te nebî ye hem reîs e bê ġeẕab

Maha çara hatî yek dî bi`s–selam
Ya Ḥebîbellah digotî xweş kelam

Min dipirsî di cewabê ez im Nûḥ
Ev e ḥemla te xwediyyê neṣr û futûḥ

Maha pênca min ẕilamek dî digot
Ya ṣefiyyê ji Xuda jê re digot

Min dipirsî ez im Hûd im di kelam
Jê re mizgîn ê şefa‘et jê meram

Maha şeşşa yek ẕilamek daxil dibû
Kir selam û reḥmetellah meşġûl dibû

Min dipirsî ev Xelîlullah dibû
Ev nebîkî pur celîl e gotibû

Meha ḥefta hat ẕilamek pur ‘ezîz
Kir selam û wî di lefẕê pur lezîz

Ew jî Isma‘il Ẕebîḥullah dibû
Bi weled kî ku nebiyye mesrûr dibû

Maha ḥeşta min ẕelamek dî weha
Bi zimankî pur feṣîḥ û rû beha

**r. 33.**
Wî digotî Xîretellah es–selam
Ew jî Mûsa tim li ser wî bin selam

Çi dixwazî ya Kelîmellah bibêj
Ev e ṣaḥib ji ayatê me‘na dirêj

Maha nehha min ẕilamek dîbû ‘eceb
Gotî ya xatem Resûlillah edeb

Min dipirsî gotî ‘Îsa ez dibim
Purrî mizgîn ji te ra bî ez dibim

Ev Resûlê pur mukerrem ḥemla te ye
Hat hilanîn tevdê îşa ser te ye

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Duwazdan di Behsa Welidandina Amîne Diya Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

[86] *Çawa gotî wî ‘Elî yê pur emîn* (Qoxî)
[87] Min di xew da yek ẕilamek şêrîn didî (Qoxî)
[88] Cumle ‘urban dê bi wan teşrîf bibin (Qoxî)

Gotî ʻalim Waqîdiyyê[89] reḥme lê
Şeva ewwel ji rebî'il ewwelê

Bi surûrî[90] Amîne tê da dibû
Şeva s̱anî bi muradê mizgîn dibû

Şeva s̱alis̱ Amînê ra hat xeber
Ê qiyama ḥemd û şukre bîn qerer

Şeva çara deng dihatê eşkere
Dengê tesbîḥê melaîk her der e

Şeva pênca di xewa xwe dîtî Xelîl
Daye mizgîn wî ji Rebbê xwe`y Celîl

**r. 34.**
Bi nebîkî pur bi qîmet hem bi nûr û hem beha
Xwedyê feżlê hem bi ʻizz û pur s̱ena[91]

Şeva ḥefta tên melaîk wê derê
Ji ḥesabê ictimaʻa wan bi derê

Pur bi ʻişq û hem bi kêfê tev dibûn
Ew zemankî ne ku hindik xalî nebûn[92]

Şeva ḥeşta deng dihatê bi`s–surûr
Ji milada wî re nêzîk ê bi nûr

Şeva nehha dengê luṭfê xweş dihat
Êş û zeḥmet tev ji ser te ew hilat

Şeva dehha mizgîn dibûn xîf û muna
Şeva yazda mizgîn dibûn erḍ û sema

Şeva dozda pur bi ruhnî ne ẕulam
Rabû ʻEbdulmuṭṭelib tevlî ġulam

Çi xerabî ê ji beytê nû dikir
Wî ji beyt û ji Xudê ra xiżmet dikir

Aminê got qeṭ li dor min kes nema
Hema hat min tirs û lerzek ji ġema

Mam tenê bê kes di wê hat min girî
Hema nêzîk min dî xanî nûr kirî[93]

Min dî hatin vê sera û menzilê
Hema çar jin pur dirêj û xweşşik belê[94]

Tev bi nûr û wekkî hîva çarde bûn
Bi pêşmalê sipî bûn û bêhn zêde bûn

Bêhna wan ê purrî fayiq[95] tê ji dûr
Wek ji tuxmê ʻEbdulmenafê bê quṣûr

Ya ku ewwel ew dihatî gotî weha
Îbşirî ya Amine bil Muṣṭefa[96]

**r. 35.**
Ew e seyyid ji beşer ra iftixar e bi ʻeceb
Jê re beyʻet û muḍer ra hem pur ʻereb

Wexta hatî ew li rastê min digot
Çi kesî tu ez Ḥewa me wê digot

Ya li dû wê hat bi ʻizz û pur surûr
Gotî wek te kes tu nîne ya jê ẕuhûr

Ṭuhr û ṭahîr beḥra zaxir[97] ev dibe
Ji beşer ra nûra bahir wê bibe

Weqta rûnîşt çi kesî tu çi xeber
Bo Xelîl ra zewcim Sara bi qerer

Ya s̱is̱iyya ku dihatî ew bi şîrîn û edeb

[89] **Waqîdî:** Ebu Ebdullah Muhammed bin Ömer bin Wâqid el-Eslemî (748 - 822; Medine); dîroknasekî navdar ê Îslamê.
[90] **Surûr**: Şadî
[91] *Bi nebî kî pur bi nûr û şewq û beha*
*Xwedyê fedlê zêde ʻizz û hem wefa* (Qoxî)
[92] *Ew zamankî pur ji wî xalî nebûn* (Qoxî)
[93] *Ku li ba min kes nema bû min dagirî*
*Hema nêzîk min dî xanî ruhnî kirî* (Qoxî)
[94] *Pur dirêj û xweşik çar jin ew bele* (Qoxî)
[95] **Fayiq**: Bilind
[96] Ev rêzik di mewlûda Melayê Bateyî de jî heye. Ev jî dide nîşan ku weke hemû mewlûdnûsên Kurd Mela ʻElî jî di bin bandora Melayê Bateyî de mane. Bi mijar û hûnandina risteyan jî Mela ʻElî eşkere di bin bandora Melayê Bateyî de ye. Nivîskarên Kurd ên mewlûdnivîs vê yekê qet înkar nekirine û Melayê Bateyî ji xwe re weke pêşeng qebûl kirine.
[97] **Zaxir**: Tije, dagirtî

Ev e ḥemla te ḥebîbê pur bi ‘izz û bi ‘eceb

Hem bi qîmet xwedyê metḥ û hem s̱ena
Ew jî rûniştî li paş min ew weha[98]

Min dipirsî çi kesî tu ez im Asiyya ku dibim[99]
Ya ku qîza ji Muzaḥim ra dibim

Ya li dû wana bi ḥusn û hem bi behcet[100] bû ji wan
Hem bi heybet hem bi qîmettir bû ji wan

Gotî mizgîn ji vê ḥemla xweş kelam
Ê delîlê ji ayat û mu‘cîzata ra temam

Ew jî rûniştî li pişt min got ev xeber
Hema pal de baş li ser min bê ẕerer

Min dipirsî çi kesî tu ya pur delal
Qîza ‘Umran ez im Meryem ya heval

Em ji bo ḥemla te hatin pîrik ji te`r
Bikne xiżmet hem jî ardimcî[101] ji te`r

Ez bi vana pur bi kêf û raḥet dibûm
Weqta hatin tev ji min ra meḥbûb dibûn

**r. 36.**
Pur merev jî ew ji der tên daxil dibin
Fewc û fewcû pur gelek tev kom dibin

Min dî xanî pur ji van ruhnî gelek
Ṣewta wan jî muxtelif bûn ew jî melek

Firra ṭeyra rast û çeppê xwe didî
Min ji wana keyf û raḥet xweş didî[102]

Got Xudayê pur ‘ezîz û hem metîn
Ê ku qaṣid ji Resûla Cibrîl Emîn[103]

Bîn şerabê ruḥ bi wan raḥet dibin
Bide mizgîn wan ḥewarî meḥbûb dibin

Wan qapaġê devê miska zû veke
Bo Muḥemmed rabe xiżmet baş bike

Ẕûka raxe wan seccadê qurb û wiṣal
Bo xwediyyê nûr û rif‘et ittiṣal

Bêje Ruḍwan ew jî vekke deryê cinan
Bêje Malik ew jî bigre wan agiran[104]

Ḥullî Ruḍwan her libas ke tu ji xwe`r re
Dakev erḍê pur melaîk bib bi xwe`r re

Ṣadiqîn û mukremîn û ḥafîn[105] hene
Ê muqerreb tevlî vana emrê te ne

‘Erḍ û ‘ezman her ṭeref gazî bike
Ins û cinna hem melaîk hişyar bike

Hatî weqta wan muḥibba bi hevdû`r bibin
Hema ṭalib hem jî meṭlûb dilxweş bibin

Hema Cibrîlê ku daîm ew delîl
Bi cî anî emrê Rebbê xwe`y celîl

Wî ḥeleq[106] kirne melaîk ḥeremî da
Hem jî seknîn di çiyayê Mekkehê da

**r. 37.**
Baskê wana pur sipiyy û kafûrî[107] bûn
Weḥş û ṭeyr û ê li çola kêfxweş dibûn[108]

Ev bi emre wî Melîkê Cebbar dibe
Wî Xudayê ‘alem jê re muḥtac dibe

Hat hilanîn keşfa çava min didî
Qeṣrê buṣra min ji erḍê Şam didî

---

[98] *Hema rûniştî li paş min ew wiha* (Qoxî)
[99] *Çi kesî tu ez im Asya ku dibim* (Qoxî)
[100] **Behcet:** Rûken, rûşen
[101] **Ardimcî:** Alîkar
[102] *Firra teyra rast û çepê min didît*
*Min î wan a zewq û raḥet pur didît* (Qoxî)
[103] *Got Xweda ê pur ‘Ezîz û hem Mûbîn*
*Ê ku qasid bû resûlan nav Emîn* (Qoxî)

[104] *Bêje Malik ew jî bigre agiran*
*Bêje Ridwan hema veke va cînan* (Qoxî)
[105] **Ḥafîn:** Ewên di derdora ‘erşê de/seqayê de sef girtî. Qafîleyek ji milyaketan e.
[106] **Ḥeleq**: Xelek
[107] **Kafûrî:** Bêhneke spî û xweş e.
[108] *Teyr û heywanat temam pê xweş dibûn* (Qoxî)

Ji serê beyraq min ‘ecaîb pur didî
Şerq û ġerb û yek li jor ra ke‘be dî

Hema ţeyr jî ew bi ref ref kom dibûn
Nuklê wana ṣor û bibazkê nûrî bûn

Lu’lû û mercan li ḥucra min reşand
Sekkinîn û bi tesbîḥa deng hiland

Ez li ḥalê xwe dinêrim pur li van
Tên melaîk min ‘ecaîb dî ji wan

‘Ûd û ‘enber hem bixûr tînin melek
Di firaġê zîv û zêr da bêhn tê gelek

Deng hilanîn bi ṣelata hevra dibin
Ser resûlê me`y mukerrem xwoş dibin[109]

Aminê got min dinêrî hîva temam
Wekî konkî pur bi şewq û bê ġumam[110]

Hem sitêrik ew jî kom bûne beha
Tasek şerbet dane dest min wan neha

Bêhna kafûr hem sipîtir bû ji şîr
Wekkî şekkir yan jî hingiv ţe‘m dibir

Pur bi zewq û hem bi leẕẕet ţe’m dibû
Min vexwarî can bi wê raḥet dibû

Şewq û nûrek daye ser min pur mezin
Min dinêrî hema ţeyrek nêzik ji min

**r. 38.**
Hem sitêrik ser min sef bûne wiha
Tasek şerbet dane dest min wan niha[111]



Çawa baskê wî li ser xwe min didî
Wê demê hatî Resûlê ku we dî[112]

Ey Muḥemmed ṣed hezaran aferîn
Tim li ser te pur ṣelat j`qelbê birîn

*Din selata ser Muḥemmed bê ḥisab*
*Ger dixwazin hûn xelaṣa ji ‘ezab*

**Fesla Sêzdan di Behsa Selewatan li ser Muhemmed Mustefa (sellelahû ‘eleyhî we sellem) de ye**

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya seyîde`l–ebrarî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Muṣţefe`l–muxtarî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya nûre`l–‘ibadî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya nasiḥe`l–‘ibadî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya menbe‘e`l–furqanî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya saḥibe`s–sulţanî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya tace`l–etqiyaî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya xateme`l–enbiyaî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya saḥibe`l–mi‘racî Ḥ

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya ṣaḥibe`l–ferecî

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Resûlellah

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Ḥebîbellah

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Ṣefwetellah

Eş–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Xeyre Xelqillah

---

[109] Bi ṣelata denk hilanîn hevra dinên
Ser resûle me Muḥemmed xweş dibên (Qoxî)
[110] Min li ‘ezman ku dinêrî hîva temam
Wekî kon kî pur bi şewq û bê xumam (Qoxî)
[111] Ev malik du orijînala nusxeya Mela ‘Elî de nîne. Qoxî bi xwe nivîsiyê û lê zêde kiriye.
[112] *Wê demê çê bû Resûlê bi xwedî* (Qoxî)

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ṭaha ya mûeyyed

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Şefî‘e`l–muẕnibîne ‘Indellah

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
‘Eḥmed ya Muḥemmed

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Ẕeyne`l–bilad

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Xîretellah

Eṣ–Ṣelatu ‘eleyk es–Selamu ‘eleyk
Ya Mehdî we Hadî

**HAZÂ DU’ÂU XETMI’L-MEWLIDI’Ş-ŞERÎF** [113]

Bismillahîrrehmanîrrehîm

Bi navê Xwedayê ku him Rehman e û him jî Rehîm e

Ellahumme ya rebbî em sûal û ricaê ji zatê Te yî kerîm, hem ji esmayê Te yên ‘ezîm dikin. Tu birijînî li ser Muhemmed Sellellahû ‘Eleyhî Wesellem. Hem li ser temamê enbiya û murselîn. Hem li ser temamê al û ewlad û eshab û ezwac û etbaê wî yê tahirîn. Ji nûr û rehmet û berekatê xwey ‘emîm.

Ya rebbel ‘alemîn! Hem li ser sadatê me Ebûbekrê siddîq û ‘Umer û‘Usman û ‘Elî, hem li ser Hesen û Huseyn û Hemze û ‘Ebbas ridaya Xwedê li ser gişa be ecme’în. Hem dîsa selat û selam li ser Muhemmed sellellahû ‘eleyhî wesellem, hem li al û eshab û ewlad û etba û ezwac û xezûr û heval û zurriyyet û ehlê mala wî. Hem dost û muhibb û ummeta wî be ya rebbel ‘alemîn.

Ellahumme ya Rebbî! Tu me sax bike li ser sunneta wî. Tu me bimirînî li ser milletê wî. Tu me heşir bikî di nava qafîleya wî. Tu me mehrûm nekî ji şefa’eta wî. Tu me ferq nekî ji şerî’eta wî. Ya Xwedayê ‘alemê.

Ellahumme ya Rebbî! Li ser van hevalê hazir bûne li mewlûda nebiyyê Te, safiyyê ji xelqê te, birijîni ji berekatê wî hedyê kerîm. Hem tu me av bidî ji hewzê Kewsera wî. Di roja tîbûniyê ji heyecana ‘ezîm. Hem Tu me bidî seknandin di cîranê wî da di cenneta ne’îm de. Hem tu me bi par bikî bi dîna wechê Xwe yî kerîm. Hem têxî hifz û selametê ji ‘ezab û ‘îqabê şiddetê xwe yî elîm. Ya rehman û ya rehîm.

Ellahumme ya Rebbî! Em ji te dixwazin bi heqqê wî nebiyyê te yî kerîm û wefa. Tu ji me re tim bibê ‘ewn û mû’în û hafiz. Hem têxî cennet û xûrefa. Hem bi berekatê wî bike riziq ji me ra, qebûl û ‘izz û şerefa. Ya men ye’lemu sirre we exfa. Ya rebbî Tu hilînî ji ser me û hazira guneh û zunûb û ewzar. Hem têxî hifz û selametê bi sirrê navê xwe yî Settar. Ji zilm û cehl û tirs û extar. Hem tu me

[113] Ev duaya xetma mewlûda şerîf e. Mela ‘Elî duaya mewlûdê bi Kurdî û pexşane nivîsandiye. Ji bilî vê nivîsê, nivîsên wî yên pexşane (kurdî) nîn in. Ji ber vê yekê ev dua girîng e. Pêşî û paşî bi ‘Erebî ye. Di nabeyna herdû duayên ‘erebî de bi kurdî dua kiriye û duaya herî mezin jî ev e. Emê li vê derê tenê duaya wî ya kurdî binivîn. Di serê vê duayê de beriya bismillahê bi ‘erebî sernivîs wiha ye: “ Hazâ mewlidû ‘*işri’l-qurân, we’l-ixlâs, we’l-mu’âwizeteyn we billahi’l- tewfîq*” yanî ev hersê mijarên quranê beramberî dehyekê ji quranê ye.

meşxûl bikî bi ta'etê xwe, di temamê ewqatê şev û rojan de. Hem qebûl bikî ji me hindikî ku 'emelê ku me kirine, di sirr û ichar. Ya rebbî di dinyayê de û di axretê da tiştê baş bidî me, me ji agirê dojehê biparêzî. Hem tu me 'efû bikî, bi 'efw û qudreta xwe ye 'efûww û xeffar.

Ellahumme yar Rebbî! Bigihînî, bi wesilînî bi qasî xêra wê tiştê ku me xwendiye, ji kelamê Te yî qedîm, hem ji bereketa xwendina mewlûda nebiyyê Te yî kerîm. Di sehîfê me û sehîfê dê û bavê me hem meşayîxê me hem mu'ellimê me, hem di sehîfê van misilmanên hazir, hem sehîfên dê û bavê wan de, hem temamê misilmanan ecme'în.

Ya Rebbî tu me û xwediyê vê mewlûdê di vê roja mibarek de, di vê se'eta bi xêr de, bikî ji wan ê ku li cem Te meqbûl in. Tu me nekî ji wan şeqîyy û mehrûman, ya rebbel 'alemîn. Ya rebbî tu fereca xêrê vekî li xwedyê derd û xeman. Tu yî rehmê li xwediyyê burc û dunya. Hem sihhet û selametê bidî muhtac û xuzzat û musafîrîn. Hem jî ehlê dîn, hem li 'ebîdê Te yên hazir hem jî ehlê dîn. Hem li 'ebîdê Te yên hazir, hem temamê misilmana hem jî zalimîn, hem amîrîn û memûrîn. Hem tu xetma bi se'adet û bi xêrê bikî yâ Rebbe'l-'âlemîn.